Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1367 12-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Di her zarokatiyekê de çîrokek

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Hesen Mihemed ê ku temenê wî 10 salî ye, da ku alîkariya bavê xwe bike bi dilekî kêfxweş bi kurê apê xwe re li bazara bajarê Qamişlo sebzeyên demsalî li ser erebokan difroşe.**



Mirov di jiyanê de bi zarokatiya xwe kêfxweşe. Ji ber xweşiya jiyanê ji zarokatiyê dest pê dike. Ji bo vê zarokê bi navê Hesen Mihemed zarokatiya xwe bi kêfxweşî derbas kir û xwendina xwe berdewam kir. Lê piştî rewşa dawî koçber di dibistanan de bicih bûn Hesen refa xwe ya 4 an bidawî nekir ji ber wê neçar ma û bi dilekî kêfxweş bi kurê apê xwe re kar kir.

### Çîroka Jiyana Hesen

Hesen kurekî biçûk ku bi temenê xwe 10' salî ye. Hesen da ku bi bavê xwe re bibe alîkar û jiyana xwe ya malbatî bidomînin Behîvan" Loziyan" difroşe. Ew her sibeh ji seat 7 an ji xew radibe û berê xwe dide bazara Qamişlo da ku Behîvan bifroşe. Lê belê Hesen ne bi tenê kar dike pêre kurê apê wî alîkare. Herwiha bavê wî di karê derbasbûyîna sêmalka de kar dike ji ber wê kurê apê Hesen li bazarê wî li ba xwe dihêle. Ew di malbatê de ji pênc kesan pêk tên û ew tenê sê kurin.

Ew li bazarê ji seat 7'ê sibehê dimîne û heya 8 ê êvarî kar dike. Temenê kurê apê Hesen jî 25 sale ew bi hev re kar dimeşînin. Ji ber ku di dibistanan de koçber tê de bicihbûn hesen xwendina xwe ya refê 4 an berdewam nekir. Ji ber wê neçar ma û bi kurê apê xwe re kar kir da ku dema xwe derbas bike û hem jî bi bavê xwe re bibe alîkar. Tevî temenê wî yê biçûk jî lê ew pir kêfxweşe ku kar dike. Ew her sibih bi dilekî kêfxweş radibe û bi kurê apê xwe re berê xwe dide kar. Di demên sibehan de Hesen wan Behîvan" Loziyan" dişone ji bo rengê wan xweşik bibe û milet ji wan bikirin. Ji ber Behîv nû daketine bazaran ew bi buhaya 50 hezarê Sûrî difroşin.

Lê daxwaza Hesen ku xwendina xwe ya refa 4 an berdewam bike û pê re jî karê xwe bike. Di wî temenê xwe yê biçûk de jî ew bi malbata xwe difikire da ku her tim bi bavê xwe re bibe alîkar. Hesen wek tu zarokan li kolanan neleyîst û di heman demê de jî bi lîstikê nefikirî. Bi wî temenê xwe yê biçûk jî bi malbata xwe difikire. Hesen niha li benda berdewamiya xwendina xwe ye, tevî hin dibistan niha hatine vekirin û xwendekar xwendina xwe berdewam dikin lê belê dibistana ku Hesen tê de dixwîne hîna koçber bicihbûyî ne. Ew di vê dema dawî de nîvê jiyana xwe li bazarê dibe. Hesen ji bo kar wiha anî ziman" Ez pir kêfxweşim di kar de".

Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## Mêjiyê çewsandina Kurdan!

Di hefteya derbasbûyî de, hink kesan aleke Kurdî ku li taxa Şêxmeqsûd daliqandibû, daxistin û ev jî bû sebeb ku bertekên Kurdan ên li vê taxê çêbibin. Piştî wê, hinek ciwanên Kurd careke din radibin alekê li cihê ala ku hatiye daxistin bilind dikin. Li ser vê bûyerê alozî derdikeve û hêzên Ewlehiyê yên ser bi HTŞ'ê ve ku niha desthilate li Şamê, li nava taxa Kurdan 4 ciwanên Kurd girtin. Heta nivîsîna vê gotarê jî agahî nebûn ka ev ciwan hatine berdan an na. Dîsa li Efrînê jî beriya vê bûyerê êrişî cihê Newrozê hat kirin û sembolên Kurdan bi erdê re hatin kişandin. Ev bûyer tevî peymanên di nava rayedarên Kurdan û desthilata demkî ya Şamê de jî dewam dikin. Herwiha ciwanên Kurd ên di dema êrişan de li Reqqa û Dêrazor û Tebqayê jî hatin girtin, hîne jî dîlin di girtîgehên HTŞ'ê de. Li gorî cîgirê rêveberiya Hêzên Asayişê ya Parêzgeha Hesekê Siyamend Efrînî, ew ê 400 ciwanên Kurd bi komî werin berdan lê di hemû daxuyaniyên rayedarên Kurd de eşkere tê gotin ku Şam dosya berdana êsîran her bi paş dixe û her dixwaze berdana wan dereng bihêle.

Li aliyê din, mijara qeydkirina Kurdên bê nasname hebû û navendên serlêdanê hatin vekirin da Kurdên bê nasname, bibin hemwelatî. Di nava gelek qeydan de hatibû nivîsandin ev kes Erebê Sûrî ye. Mirov destpêkê li vê yekê şaş ma, gelo ma rêjîma Baas kengî Ereb bê nasname kiribûn? Piştî destwerdanê ku ev mijar bû rojeva tevna civakî û cihê bertekan di nava xelkê de, hinekî sereraskirin çêbû. Lê gelo hemû Kurdên ku welatiyên Sûrî ne û li ser nasname û Passportên wan tê nivîsîn, " Hemwelatiyê Ereb ê Sûrî" ew ê çawa sererast bibe?

Ev hin bûyer bûn ku di hefteya derbas bûyî de qewimî bûn, me ji we re rêz kir. Ev bûyer ne tesadûf an jî şaştiyên takakesî ne, lê belê mêjîyê Baasî ku kirasê îslamê jî lê hatiye kirin raber dike. Her çiqasî bi gotinê dibêjin ku piştî ewqas şer û aloziyan bila xelk hinekî serbest jiyan bike, lê di kiryar û tevgera van rêjîmên şofînîst û îslamîst de, kîna li hember hemû neteweyan û bi taybetî Kurdan xwe dide der. Tişta ku berê rêjîma Baas li ser Kurdan dimeşand, niha jî li ber çavan e. Belkî HTŞ û gurûpên ser bi wan ve ji ber li dunyayê teşhîr bûn û dixwazin hinekî rûyê xwe sipî bikin, dengê xwe zêde dernaxin, lê dîsa jî ev bûyer ji bo Kurdan ne cihê rêzê ne. Yê îro sembolên Kurdan qedexe bike, di nasnameyê de wî bi ereb pênase bike, ne dûre dema erd lê fireh bibe, Pirtukên bi zimanê Kurdî jî wekî berê suc bibîne. Lewra, ya pêwîst ew e destûrekî nû ji bo Sûriyê were nivîsîn û mafê Kurdan tê de bê bi cih kirin, an na, ew ê Kurd wekî berê bê nasname jî bên hiştin û ji bo zimanê xwe bikevin hebis û zîndanan jî.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER BÊDADÎ Û NEWEKEHEVBÛNÊ**

**Bi wî çavî lê nenêrî:**
- Dîtina wî derbarê wê tiştê de ne wisa ye.

**Hej li ser tenûrê danîn:**
- Dora xwe danî; ket dorê.
(Li gundan ji bo nanpehtinê hej datanîn ser tenûrê da bê zanîn ku dora wan e)

**Hemû ker bi wişekî nayên ajotin:**
- Bi her kesî re mirov nikare heman danûstandinê bike; her kes, divê mirov li gorî wî nêzîk bibe; her kar divê li gorî wî mirov xwe jê re amade bike.

**Her dar ne xweşber e:**
- Hevaltiya her kesî ne xweş e; mirov tev ne weke hev in.

**Her dara morîk pê ve ne ziyaret e:**
- Divê mirov wisa bi korayî baweriya xwe bi her kesî neyne.

**Her giya nabe rîsî:**
- Her kes bi kêrî her tiştî nayê.

**Her kesê Fileh be navê wî ne Îşo ye:**
- Her kes ne weke hev e; divê mirov bi her kesî re hemen danûstandinê neke.

**Her pênc tilî ne weke hev in:**
- Dema ji malbatekê, yan ji civakekê hin baş bin, hin nebaş bin hingê tê gotin.

**Ji hemû hêkan çêlîk dernakevin:**
- Her kes weke hev jîr û jêhatî nabe.

**Ji xwe pê ve diçe:**
- Ji ber ku ew wisa ye her kesî weke xwe dizane.

**Li her sûkê bazarek e:**
- Her kes pîvaneke wî heye; her kes ne weke hev e; her kes xwediyê rêbazekê ye.

**Ter û hişk dan nava hev:**
- Şerê her kesî kir; dijûn ji her kesî re kirin; ferq nexist nevbera ti kesî.

**Teştî min hincanî te:**
- Teşt ji me re hincan ji te re; tişta baş ji min re ya bi kêrî tiştekî neyê ji te re.
(Hincan ji axê çêdibe)

**Tiliyên destan tev ne yek in:**
- Mirov birayên hev jî bin dibe ku ne weke hev bin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## Nexweşxaneya Telasîmyayê bi kêmbûna xwîn û dermanan re rûbirû dimîne



Rêveberê Nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd a Telasîmyayê Ehmed Hacî diyar kir zêdetirî 450 nexweşên Telasîmyayê li nexweşxaneyê tên tedawîkirin, ji ber hejmara wan a zêde, nexweşxane zehmetiyan di peydakirina xwîn û dermanên pêwîst de dikşîne.**R-7**

## Tevî astengiyan Şaredariya Amûdê xebatên xwe berdewam dike



Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihemed Omerî destnîşan kir ku rewşa avhewayê bandoreke mezin li ser temamkirina projeyên şaredariyê kir û got, "Armanca me başkirina rewşa xizmetguzariyê û hêsankirina jiyana gel e, lewma tevî astengî û zehmetiyan em ê projeyan temam bikin."**R-8**

## Sembola jina têkoşer Uweyş Ocalan



Dayika têkoşer Uweyş Ocalan di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber nexwaşiya şekir jiyana xwe ji dest dide. Lê berxwedanî û bandora dayika Uweyş wê her di bîra gelê Kurd de, jiyan bike.**R-2**

## Koma Berxwedan 'Li mîras û kelepora xwe xwedîderketin' piştî 7 salan derket pêş

Hunermendê destpêkê yê Koma Berxwedan Cewad Merwanî anî ziman ku Koma Berxwedan a ku ji salên 1983'an ve ava bûbû û di 2019'an rawestiya bû, bi mijûlbûyîn û perspektîvên Rêber Apo dihate birêvebirin...**R-9**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1367 12-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BI HEBÛNA YPJ'Ê PARASTINA JINAN MISOGER DIBE

Endama Sîwana Meclisên Jinên Êzidî li Ewropayê Nûrê Alkiş diyar kir ku YPJ'ê ji roja damezrandina xwe ve bûye hêzeke girîng di parastina civak û nirxên mirovahiyê de, fedekarî û cesareta şervanên wê ji jinên azadîxwaz re bûye nimûne. YPJ'ê hêvî, azadî û jiyana nû ji bo tevahî jinên Kurd û yên cîhanê ava kir, ew temsîlkara hêz û îradeya jina azad e. Ji ber wê parastina hebûna YPJ'ê erka tevahî jinan e.**R-2**





## 'Komuna demokratîk û azad dibistana bingehîn e'

Sîstema komun û meclisan ji destpêka Şoreşa Rojava ve hatin avakirin, armanca sereke ji avakirina wan ew bû ku civak bi rengekî hevbeş û komînal bi hevre jiyan bike. Di heman demê de xwebirêvebirina civakê di hemû qadan de ji civakê bi xwe be.**R-4**

Jin û komîn; îfadeya jiyana hevbeş
İsyan Karadeniz R-2



Sûriyê di bin navê veberhênana aborî de tê firotin
Idrîs Henan R-4



Islam û mafê karkeran
Hafiz Ahmet Turhalli R-7



Ji nû ve Koma Berxwedan
Remezan Olçen R-9

# Bi hebûna YPJ'ê parastına Jinan misoger dibe

Endama Sîwana Meclisên Jinên Êzidî li Ewropayê Nûrê Alkiş diyar kir ku jinên di YPJ'ê de cih digrin, ne temsîla yek rengî, netewî û baweriyê dikin, YPJ'ê temsîlkara hêz, artêş û îradeya jina azad ji hemû jinên cîhanê re dike û ger hikumeta Sûriyê qebûl neke, wê nikaribe di demokrasiyê de rol bilîze.

**Esma Mistefa**

Jinên ku daketin qadan û cihên xwe di avakrina bingehên yekemîn yên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ya ku weke Şoreşa Jin tê naskirin, bi avabûna hêza YPJ'ê di 2013'an de, temam bû û mohra xwe li hemû şoreşên jinan di cîhanê de xistin. Bi geşedan û herikîna bûyerên ku di Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê de têne qewmandin re, hebûn û parastina YPJ'ê, şert e.
Têkildarî vê yekê jinên Kurd yên ku Ewropayê xebat didin meşandin, Endama Sîwana Meclisên Jinên Êzidî li Ewropayê Nûrê Alkiş ji Rojname me re axivî.
Nûrê Alkiş di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku ger hebûneke gelê Kurd niha heye, ew bi felsefeya Rêber Apo mayînde bûye û wiha got: "Em gelê Kurd ne 4'ê Nîsanê weke rojeke rojbûna mîmarê felsefeya Azadiyê ya Rêber Abdullah Ocalan dibînin, di heman demê de roja vejîna gelê Kurd di giştî cîhanê de ye. Di hemwextiya vê dîrokê de ku çawa Rêber Apo yekem kesê bi maf û hebûna jinê derketiye pêş, Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê li Rojavayê Kurdistanê di heman dîrokê 4'ê Nîsana 2013'an de hate avakirin. Em vê rojê û hêzê li hemû gel û jinên azadîxwaz pîroz dikin. YPJ'ê ji roja damezrandina xwe de bûye îrade û hêzeke girîng di parastina civak û nirxên mirovahiyê de. Fedekarî û cesareta ku wan di di dîrokê de kiriye, cihê xwe yê taybet xêz kiriye ku niha hemû cîhan hebûn û fedekartiya vê hêzê nas dike. Di van demên watedar de em hemû kesên ku di vê riyê de fedekarî kirine û canê xwe feda kirine, em li hember hemû şervanên jin û mezinahiya wan, ditewînin."

**'Parastina YPJ'ê erka me hemûyan e'**

Nûrê di domdariya axaftina xwe de ev anî ziman: "YPJ'ê hêvî, azadî û jiyana nû ji bo tevahî jinên Kurd û yên cîhanê avakir. Ji ber wî jî em bi taybet jinên Êzidî YPJ'ê em rêzî ji hebûn û sekna wan re pêşkêş dikin. Taybetmendiya YPJ'ê ew e ku ne tenê nasnameya civak û jinan parasti di heman demê de nasnameya hemû ol, netew, bawerî û pêkhate parast. YPJ'ê di dema fermana Tebaxa 2014'an de ku êrişên DAIŞ'yan hatin ser civaka Êzidî. Hêza YPJ'ê zend û bendên xwe pêçandin, gulliyên xwe hunandin û daketin qada hebûn û nebûnê û ber bi hawara dayik, keç û zarokên civaka Êzidî ve çûn.
Ji ber wê yekê ev yek ji deh sedemên ku em YPJ'ê hêz û nirxa xwe dibînine û em dibêjin "YPJ'ê nebe, qet nabe". bi taybet ji bo civaka Êzidî di dema rejîma Baas, di dema opozisyon û DAIŞ'ê de li Sûriyê û her wiha di Başûrê Kurdistanê û Iraqê de her tim civaka Êzidî bi kiryar û qetlîaman re rûbirû maye. Tenê bi felsefeya Azadiyê, hêza YPJ'ê, YPG'ê û Gerîlayên azadiyê ev civak hate parastin. Parastin û piştgiriya YPJ'ê şert e û erka me hemûyan e."

**'Ger hikumeta heyî hêzên jin qebûl neke wê nikaribe xwe bi rengê demokrasiyê nîşan bide'**

Nûrê di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku ger hikumeta demkî ya Sûriyê hebûna hêzên jin qebûl neke, wê demê Sûriyê nikare ber bi demokrasiyê ve biçe û wiha got: "Em dizanin niha pêvajoyeke nû di Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê de hatiye destpêkirin, ger hikumeta heyî hêzên jin qebûl neke wê demê nikare xwe bi rengê demokrasiyê nîşan bide, ger hêzên jin nîn be wê



demê qet nabe. Ji lewra Em bi hemû hêz û îradeya xwe weke Sîwana jinên Êzidî, Tevgerên Jinên Kurd dibêjin ku em li pişta hêza xwe ne, em li pişta hêzên ku nirxên jin û mirovahiyê patastine. Ji ber ew hêz û hêviyên me ne. Em viya tekez dikin ku bi mayîndebûna hêzên YPJ'ê ancax Sûriyê di pêvajoya nû de xwe îsbat bike. Jinên ku di YPJ'ê de cih digrin, ne temsîla yek rengî, netewî û baweriyê dikin, ew temsîlkarên hêz, îrade û hebûna jinan li tevahî cîhanê dikin. Çeka wan ne çeka ku pê şer dikine, çeka wan ew keziyê wan yê hunandiye. Ji ber wê em dibêjin bê jin demokrasî û jiyana wekhev ava nabe, bê hebûna jin di qada siyaset, civak û leşkerî de, wê civak û dewletên heyî nikaribin demokrasiyê bidest bixin."

# Sembola jina têkoşer Uweyş Ocalan

**Stêrk Mihemed**

**Dayika têkoşer Uweyş Ocalan di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber nexwaşiya şekir jiyana xwe ji dest dide. Lê berxwedanî û badorê dayika Uweyş wê her di bîra gelê Kurd de jiyan bike.**

Dayika Rêber Apo dayika Uweyş ku dayika hemû Kurdan e, xwedî kesayetek bi bîr û bawerî bû. Jinek bi hêz û têkoşer bû. Çavên xwe ji ne mafiyê û şaştiyan re nedigirt. Dayika Uweyş ev 33'an li nav me barkiriye, lê sekin û berxwedaniya wê di nav me de jiyan dike ku her û her em ê li ser wê esasê bimeşin.

**Uweyş Ocelan kiye?**

Dayika berxwedêr Uweyş Ocalan di sala 1918'an de li Gundê Amara yê girêdayî Xelfetî ya Rihayê ji dayik bûye. Di temenekî biçûk de bi kesekî ji gundê nêzî wan re tê zewicandin. Bi vê zewacê re jiyana wê ya dijwar dest pê dike. Ew dibe şahida kuştina jinek ji aliyê hevjînê xwe ve, vê yekê li dadgehê dibêje û dibe sedem ku hevjînê wê ceza bigire. Dayika Uweyş di heman demê de li hember hişmendiya mêrsalar têkoşîn dike. Ew kesê ku hevjînê wê ye, li girtîgehê qeyrana dil derbas dike û dimire. Keçek dayika Uweyş ji hevjînê wê yê yekem hebûye.
Dayika Uweyş piştî mirina hevjînê xwe vedigere gel malbata xwe û paşê jî bi Omer Ocalan ê ji heman gundî re dize-



wice. Bi zewaca duyem re jî têkoşîn û berxwedana wê ya jiyanê dewam dike. Ji vê zewacê çar keç û sê kurên wê çêdibin. Uweyş Ocalan a bi kesayeta xwe ya berxwedêr tê nasîn di 4'ê Nîsana 1949'an de Rêber Abdullah Ocalan tîne dinê. Dayika Uweyş jî têkoşîna li dijî nexweşiyê dide. Ji ber nexweşiya şekir li Edeneyê tê derman kirin. Di vê têkoşîna jiyanê de di dawiyê de lingekî wê tê jêkirin. Piştî tedawiya salekê di 11'ê Nîsana 1993'yan de ji ber qeyrana dil koça dawî dike. Bi wefata dayika Uweyş re di nava gelê Kurd de xemgîniyek hat jiyin, ji ber ku weke dayîka hemû Kurdan bû. Canazeyê dayîka Uweyş li gundê Amarayê bi xatir xastina dawî ji hêla kesên jê hezdikin ve dispêrin axê.

**Uweyş Ocalan jinek têkoşer û bi hêz bû**

Dayika Uweyş bi hêz û têkoşîna xwe tê naskirin. Teslîmiyet û serî tewandin li ber şaştiyan qebûl nedikir. Xwedî seknek bi bandor bû ku her kesî hesab jê re dikir, ji kesî neditisî û li hember hişmendiya zilamê serdest liberxwe dida. Herwiha tola xwe ji kesî re nedatanî û wê bi çi rengî be hilîne. Mînaka ku wê di bîra me hemû Kurdan de zindî bimîne ku rojekê Rêber Apo dema biçûk bû vedigere male kurê cîrana serê wî bi kevir şikandiye, dema ku dayika Uweyş vê yekê dibîne bi Rêber Apo re dibêje tê venegerî mal heta ku tu tola hiltînî. Dayîkek bi vî rengî bû ku li ser mafê xwe bêdeng nebe û mafê kesî ji nedixwar. Em dikarin bêjin ku Rêberê me Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan hin taybetmendiyên xwe ji dayîka xwe girtiye. Dayika Uweyş ji sala 1993'an de ji nav me barkiriye, lê belê bandor, têkoşîn, berxwedanî û hêza wê di nav me de jiyan dike. Dayîka Uweyş jer roj di bîra gelê Kurd de ye ku çiqas şanazin kesayetek mîna Rêber Apo anî û mezin kir.

**Nirxandinên Rêber Apo li ser dayîka Uweyş**

Jineke ku bi aliyên xwe yên erênî yan jî neyînî bandor li ser tevgera azadiya jinê jî çêkiriye dayika min e. Li Kurdistanê rastîqîniyek din ku divê em li ser bisekinin jî rastiya dayikê ye. Dayiktî piranî îfadeyek zayînê ye. Li cem me wateya herî hêsan a dayiktiyê wiha ye ku tu yê gelek zarokan bîne dinê û nifşê xwe bidomînî. Ez ji destpêkê ve li dijî vê yekê derketim. Dikare bê gotin ku bersiva herî tund min bixwe daye dayika xwe. Wê wekî dayikakê hemû mafê xwe yê li malê disparte wê yekê ku ez anîme dinyayê. Min jî jê re digot: "Tu vê mirîşk û çîçikên wê dibînî yan na? Mirîşk ji bo çêlika xwe çiqas dayik be, tu jî ji bo min ewqas dayîkî." Ev şibandinek pir qebe bû, lê min ev kir. Ji wê jî zêdetir min gelek caran nêzîkahiyek di wateya wekî "Li şûna ku zarokên te yên wiha hebin, bila qet nebin baştir e" nîşan dida.
Zarok nikare wek xwesteka xwe bijî, dayik jî dixwaze bi zarokê xwe re hebûna xwe bidomîne, ev nakokiyek e. Heqê dayiktiyê tenê bi têkoşînek bêhempa dikare bê dayîn. Ji bo dayikekê jî maf di esasê de wisa tê dayîn. Ji bo jinekê çawa eleqe dikare bê nîşandan? Me di rêbaza xwe ya şîroveya azadiya jinan de nîşan daye, ji bo dayikê jî bi vî awayî dikare bersiv bê dayîn. Hewce bi girtina diyariyên biçûk tune ye şîrovekirina azadiya jinan li gorî min rêzdariya herî mezin a ji bo dayikê bê nîşandan e.

Akademiya Jîneolojî

## Jin û komîn; îfadeya jiyana hevbeş

**İsyan Karadeniz**

Pergala komîn, paradigmaya kominal û her wekî din gellek caran em bi peyva komînê rast lê tên û kominalite wek şewazekî jiyanê derdikevê pêşiya me.
Li gori gellek çavkaniyan peyva komin ji peyva communis a bi zimanê latinî tê û tê wateya hevpar, parvekirî û giştî.
Wekê inkarkirina nasnameya jinê û hebuna gelê Kurd; zimanê Kurdî jî hatiye inkarkirin û gellek peyvên ku koka xwe Kurdî ne jî tune hatiye hesibandin. Peyva komîn di zimanê Kurdî de jî di wateya xwe ya kombun, bi hev re an ji hevpar, yekparebunê de tê karanin her wiha di nava jiyanê de jî bi vê awayî tê jiyîn.
Di vê erdnigariyê de kominalite ne tene li ser kaxizan hatiye xêz kirin an jî li ser ziman tê bilev kirin, di hevsengiya dayin û standina nava jiyanê de şeklekî xwezayî derdikevê pêşiya me. Di dirokê de jî ji Karmatiyan heya Komara Mahabatê, iro di Şoreşa Rojava de di mozaika gelan de li ser vê axê ceribandinên jiyana kollektif her tim çebû ye. Damarek hevpariyê ya civakê derketiye pêş û her tim di nava vê kominaltiyê de şopekî ya jinan hebu ye.
Ji ber vê jî êrişên hêzên serdest, katilê kastik herî zêde li ser jin û kominaliteya civakê ye.
Hewceye ji xwe pirs bikin çima em evqas dibin hedef? Çima yê ku herî zêde tê reş kirin, jin, civakê li dora jin, tevgerên dora jinê an jî têkoşînên ku ji bo van tê kirin e? Helbet sedemekî mezin û giring heye ku, ji dîrokê heya niha beramberî nasnameya jin û civakê plan, proje yên talankirin, tecavûz û rewandinê, bi dara zorê koçberkirinê hatine amadekirin û pekanîn. Di rûpelên dirokê de jî aliyê desthilatdaran ve wek sedemên êrişbirinê hatine nişandan û pê re dirokek derewîn hatiye nivisandin. Ji ber vê giringe ku em dirokê heqiqî ya jinê û civakê bilev bikin, binivîsinîn, yê ku taritî de hatiye hiştin lêbikolin û derxinin ronahiyê.
Civak bi parvekirin, dabeşî, hevpariyê ve dibe civak, civakê exlaqî û politik bi nirxên xwe yên kominalite ve digihijê azadiyê. Ji ber vê jin û jiyan, nirxên ku bi civaka jin dayikê hatine afirandin her tim ji heman kokê tê û bi hev re dibe nasname. Dema ku nasnameya jin a di 4 qatmanê da teşe girtî lêbinêrin, heta roja îro çiqasî ji civakê, ji kominê hatiye qut kirin; jî nasnameya xwe ya esasê durketiye hîn zelal dikarin bibînîn. Rêber Apo, vê ya wekê ''Jin; cewhera civakê ye.'' bilev dike û her wiha di derbarê civakbunê de jî tîne ser ziman ku di cewhera civakbunê de kominalbuyin heye. Li gorî vê rastiyê jin û civak qasî ku kominale evqasê azad e, evqas nirxên azadiyê di jiyanê de dihewine, evqas exlaqî û politik e. Yên ku xwedî nirxên exlaqî û politik in, dikarin bibin xwedî gotin û pratik. Gîrêdanbuna bi hêz a van rastiyan ''kom'' ifadeyek civakbuyinê ye.
Di seranserê cihanê de pir minak hene ku civak bi şewazek kominal jiyan dikin, ev di usulê imece ya li Anatolya, bi felsefeya "Buen Vivir" (Jiyana xweş/baş) a li Abya Yala, Consejo Comunal a li Venezuela, Chiapas a li Meksikayê, Auroville a li Hindistanê, Christiania ya li Danimarkayê,Tamera ya li Portekizê, Twin Oaks a li ABD û Damanhur ya li İtalyayê hin ji wan minaka ne kû civak bi şewazên kominal xwe birêxistin dikin. Ceribandina ku di Şoreşa Rojava de derketiye pêş ev e ku Şoreşa Rojava heman demê şoreşa jin e, jin û komin bi ceribandinên xwe yên bi rêxistinbunê ve derdikeve pêş. Hey niha gellek ceribandin çêbu ne lê belî ji ber kêmbuna rêxistinbun û gihandina pergalekî daîmi nehiştiye ku bigihijê heya roja iro, tene şopên xwe li pêy xwe hiştine. Niha li keleka zanebuna rêxistinbun û xwe parastinê, bi pêşxistina Jineolojî ve li ser vê axê çanda xwedawend zindî dibe. Hebun, zanebun û şekil girtin bi buyina jin ên kominê ve digihijê ''hevpariyê.''



# Li cîhanê festîvalên çandî nasnameya gelan nîşan dide

Li cîhanê festîvalên çandî yek ji çalakiyên ku cihêrengiya çandî û taybetmendiyên gelan nîşan dide, di heman demê de nasnameya çandî xurt dike.

**Jîn Hisên**

Festîvalên çandî di cîhanê de yek ji giringtrîn çalakiyên ku cihêrengî û nasnameya çandî ya gelan nîşan dide û xurt dike ye. Ew ne tenê huner û adetên herêmî pêşkêş dike, lê wekî platformên ji bo xurtkirina danûstendina di navbera çandên cuda, tê hesibandin. Di heman demê de pirên ji bo lihevkirin û rêzgirtina ji hev re, ava dike. Ev çalakiyên bêhempa mîrateya çandî ya herêmî, hunerên gelêrî, cilên kevneşopî, mûzîk û xwarinê nîşan dide, ku dihêle tecrûbeyeke dewlemend be ji kesên ku beşdar dibin.
Di rêya festîvalên çandî, bal tê kişandin li ser nirx û baweriyên ku nasnameya civakan ava dike. Tê de adet û kevneşopiyên her çandekê tê nas kirin, ev yek dihêle ku ji hev fêmkirina di navbera gelan de bê xurtkirin. Herwiha ev çalakî dibin wekî derfeteke ji bo naskirina hunerên herêmî yên ku afirînerî û nûjeniya çandên cûda nîşan didin.

**Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Rojava**

Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Roajava ji sala 2016'an ve dest pê kiriye, her sal bi beşdarbûna lîstikvan, derhêner û çêkerên fîlam li ser asta cîhanê, tê li dar xistin. Armaca vê festîvalê ew e ku çîrok, azar û êşa ku gelê kurd derxînin holê. Di heman demê de zimanê Kurdî bibe zimenek di sînamaya cîhanî de, di rêya pêkêşkirina rastiya civaka Kurdî û têkoşîna wan ji bo bidestxistina azadiyê.
Di festîvalê de gelek fîlm, belegefîlm û kurteçîrok têne pêşkêşkirin û bi zimanên cuda wekî Erebî û Înglîzî têne wegerkirin, da ku her kes karibe beşdarî temaşekirina fîlman bibe û hejmarên mezin ji derhêner û lîstkvanên di seranserî cîhanê de berhemên xwe di rêya festîvalê de pêşkêş bikin. Hersal bi dehan ji derhêneran ji çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê tevlî dibin. Herwiha di fîlmên hilbijartî de li ser azadiya jinan û têkoşîna gelan ji bo azadiyê tê rawestandin. Herwiha di festîvalê de semîner, perwede û panêl ji bo beşdaran tê li dar xistin.
Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Roajava bûye wekî platformeke girîng ji bo pêşvebirina hilberîna fîlaman herwiha avakirina pirên danûstendê di navbera Kurdistan û Cîhanê de.
Festîvala, ji bilî berhemên ji Kurdistanê, rê dide ku fîlmên ji welatên din jî bê nîşandan ku ev yek dîmenek çandî û mirovî ya berfireh dide festîvalê. Bi rêya festîvalê, hewildan tê kirin ku çanda nîşandana fîlman pêş bixe, nemaze piştî salên ji paşguhkirin û dûrxistinê, ji ber ku fîlmên ku bi zimanê Kurdî an rastiya gelê Kurd nîşan bidana, tune bûn.

**Festîvala Fîlman a Kan –Fransa**

Festîvala Fîlman a Kan yek ji festîvalên fîlman ên herî navdar di cîhanê de ye, ji sala 1946'an dest pê kiriye, êdî her sal li bajarê Kan ê Frasnayê tê li dar xistin. Di festîvalê de komek ji fîlmên hunerî û afrîner ên cihêreng tê pêşkêş kirin. Tê de derhêner, çêkerên fîlman û lîstkvan ji çar aliyên cîhanê beşdar dibin. Bi salan, Festîvala Kan bûye sembola afirînerî û nûjeniyê di pîşesaziya fîlman de.
Bandora Festîvala Fîlman a Kan'ê li ser hemû aliyên pîşesaziya fîlman a cîhanî dirêj dibe. Ne tenê pêşandana fîlman e; ew çalakî, nîqaş û diyalogên di navbera çêkerên fîlman û rexnegiran de jî vedihewîne. Festîval bala medyayê û raya giştî jî dikişîne, ku ev yek jî dibe alîkar ku fîlmên ku têne pêşandan zêde bibin. Ji ber vê yekê, pesn an rexneyên ku ji fîlman re têne kirin bandorek rasterast li ser şopa wan di bazarên navneteweyî de dike.

**Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Tokyo**

Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Tokyo, bûyerek sînemayî ya girîng e ku di sala 1985'an de dest pê kiriye û bûye platformek sereke ji bo pêşandana fîlmên navxweyî û navneteweyî. Festîval her sal li paytexta Japonya tê lidarxistin, çêkerên fîlman, rexnegir û hezkiriyên fîlman ji çar aliyên cîhanê beşdar dibin. Ev çalakî danûstandina çandî di navbera Japonya û welatên din de pêş dixe.
Yek ji taybetmendiyên berbiçav ên Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Tokyo hilbijartina wê ya curbicur fîlman e, di nav de fîlmên dirêj, belgefîlm û kurtefîlm hene. Ev cûrbecûrî dihêle ku mêvan tecrûbeyên çandî yên cihêreng







keşf bikin û dengvedana gerdûnî ya sînemaya hemdem nîşan dide. Herwiha di festîval de semîner, nîqaşên panelê û rûniştinên danasînê ku li ser pîşesaziya fîlman, disekinin herwiha têkiliya di navbera civaka herêmî û navneteweyî de pêş dixe.

**Festîvala Holî – Hindistan**

Festîvala Rengan, ku wekî Holî tê nas kirin, yek ji festîvalên çandî yên herî zindî û girîng ên Hindistanê ye, her sal di werzê Biharê de tê pîrozkirin. Yek ji sembolên vê festîvalê xurtkirina hezkirinê di nava civakê de ye. Di heman demê de ruhê nasnameya Hindistanê nîşan dide, ku bi çand û baweriyên wê yên cihêreng ve tê xuya kirin. Holî li seranserî Hindistanê tê pîrozkirin û bandora wê li gelek welatên din, di nav de hin welatên li cîhana Erebî jî, dirêj dibe.
Pîrozbahiyên Holî bi gelemperî di êvara Holî de dest pê dikin, dema ku agirê êvarî wekî beşek ji rêûresmek bi navê "Holi Ka Dahan" tê pêxistin. Ev çalakî wekî sembola dûrxistina ji xerabiyê û nûkirina hêviyê tê hesibandin. Roja din, gel li kolan û parkan dicivin da ku di merasîmek coşdar de ku ruh û şahiya civakê nîşan dide, bi rengên geş hevdu birijînin. Di festîvalê de boyaxên xwezayî yên ji rengdêrên nebatî hatine çêkirin, têne bikar anîn, ku hebûna wê wekî kevneşopiyek çandî û tenduristiyê xurt dike.
Di çalakiyên Holî de stranbêjî, guvend û xwarinên kevneşopî yên wekî gojia, malbi û bhohra jî dihewîne. Çalakiyên civakî û kêfê beşek girîng a pîrozbahiyê ne, ku malbat û heval dicivin da ku kêf û şahiyê bi hev re parve bikin.
Girîngiya Festîvala Holî di wê rastiyê de ye ku ew nirxên biratî û yekîtiyê di pirrengiyê de temsîl dike, ku ew ne tenê ji bo Hindistanê dike sembola çandî, lê di heman demê de wekî pirek di navbera çandên cûda de, heta li cîhana Erebî jî.

**Festîvala Wêjeyî ya Oxfordê**

Festîvala Wêjeyî ya Oxfordê yek ji girîngtirîn çalakiyên çandî ye ku wêjeyê wekî amûrek ragihandinê di navbera çand û civakan de pîroz dike. Festîval salane li Oxfordê tê lidarxistin û hejmareke mezin ji nivîskar, ramanwer û rewşenbîran ji çar aliyên cîhanê tê de beşdar dibin. Ev bûyer wekî platformek berbiçav ji bo nîqaşkirina mijarên wêjeyî yên hemdem ên ku li ser pirsgirêkên civakî, siyasî û çandî yên ku civak îro pê re rû bi rû ye, disekine.
Bi beşdarbûna Festîvala Wêjeyî ya Oxfordê, nivîskar û ramanwer mijarên li pêş cîhana wêjeyî nîqaş dikin, diyaloga navçandî pêş dixin. Di festîvalê de panel, xwendinên wêjeyî û semîner tê pêşkêşkirin, ku tê de raya giştî dikare rasterast bi nivîskaran re têkilî dayne. Herwiha girîngiya wêjeyê di şekildana hişmendiya civakî û zêdekirina têgihîştina hevbeş di navbera çandên cûda de destnîşan dike.
Bi rêya vê çalakiyê, Festîvala Wêjeyî ya Oxfordê nîşan dide ku wêje çawa dikare wekî pirekê di navbera çandên cuda de tevbigere û di cîhanek cihêreng û tevlihev de bibe sedema têgihîştinê di navbera civakan de. Festîval ji bo rewşenbîr, nivîskar û raya giştî derfetek peyda dike ku bi hev re bicivin, ramanan parve bikin û ezmûnan biguherînin û ew dike bûyerek girîng di salnameya çandî ya cîhanî de.

**Girîngiya festîvalên çandî**

Festîvalên çandî beşek girîng a mîrateya çandî û mirovî ne, derfetan pêşkêş dikin da ku diyalog di navbera çandên cûda de were pêşxistin û têgihiştina hevbeş di navbera gelan de kûrtir bibe. Ev çalakî tecrûbeyeke bêhempa pêşkêşî beşdaran dikin herwiha kevneşopî û pratîkên çandî yên cihêreng nîşan didin ku dihêle rêz û teqdîra ji bo cihêrengiyê pêş bixin. Pîrozkirina festîvalên çandî dibe alîkar ku nasnameya kolektîf û girêdanên civakî di nav civakan de xurt bibe.
Di heman demê de, festîval ji bo danûstandina çandî cihekî guncav e, ku mêvan dikarin bi huner, muzîk, xwarin û çalakiyên ku çandên cihêreng temsîl dikin re mijûl bibin. Festîval cûrbecûr çalakiyan li dar dixin, di nav de pêşandanên zindî û bazarên kevneşopî, ku wan dike tecrbeyên dewlemend ku mîrata civakên cûda nîşan didin.

# ‘Komuna demokratîk û azad dibistana bingehîn e’

Sîstema komun û meclisan ji destpêka Şoreşa Rojava ve hatin avakirin, armanca sereke ji avakirina wan ew bû ku civak bi rengekî hevbeş û komînal bi hev re jiyan bike. Di heman demê de xwebirêvebirina civakê di hemû qadan de ji civakê bi xwe be.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Komun û meclis ji destpêka şoreşê ve bi armanca derbaskirina modela dewletê û pêkanîna demokrasiyê li ser bingehê mafên jinan û pirrengiyê, hatin avakirin. Ji bo birêxistinkirina civakê, komun û meclis hêzên herî sereke ne, herwiha ew di nava xwe de civakek siyasî û exlaqî ku tê de hemû mirov beşdar bibin û nirxên exlaqî yên civakê bêne parastin, dihewîne. Hem jî ev wekî mekanîzmayek sereke li dijî pergalên desthilatdariyê yên wekî kapîtalîzm û baviksalariyê ye.

### Komun li ser bingeha rastiyên civakî hatine avakirin

Komun yekser nûnertiya vîna civakê dike ku li ser bingeha 5 heta 6 komîteyan xwe birêxistin dike wekî komîteyên; Jinan, xizmetguzarî, lihevanînê, ciwanan, parastin û tenduristiyê. Rêbazê komunê ji bilî van qadan, di qadên wekî çandinî, zanistî û perwerdê dikare pêk bê.

Şêwazê avakirina komunê xwe dispêre rastiyeke civakî ku me her kesî dîtiye. Di gundan de ji dema kevnar de heya niha jî jiyana komunal li pêş e, çi pirsgirêk li hemberî her ferd ango mirovek derdiket, hemû kesên ku liwê gundê dijiyan li kêleka hev disekinîn û hêz didan hev ji bo çareserkirinê, heman rewş dema ku şahî hebe hemû gundî bi hev re kêfxweş dibin. Ev yek kom an jî komuneke, bi vê pênaseyê ji bo kolan, tax û bajaran mirov dikare bikar bîne. Di sîstema komunê de ev yek tê meşandin hemû ferdên di nava komunê de, di nava taxê de bi hev re kar dikin, pirsgirkên heyî çareser dikin û gelek komîteyan di nav xwe dihewîne.

Endamên komunê bi vîna taxê tên hilbijartin, li gorî vê baweriyê jî tevdigerin, da ku bikaribin erka xwe bi rengekî rast pêk bînin. Komun saziya herî biçûk e, lê di warê bandorê de jî zemînê bingehîn e.

### Komun biryardayîna mezheb û olan garantî dike

Alternatîf li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser bingeha tekezkirina nirxên komunal, hêza civakê, girîngiya azadiya jinan û hevkariya xurt bi hemû ol û etnîkeyên din re, hat avakirin. Ji xwe ya herî girîng ew bû ku bêyî azadiya jinan û hevkariya xurt bi hemû gelên li herêmê dijîn, demokrasiya rastîn ne mimkun bû.

Netew-dewleta wekî dijberê demokrasiyê tê dîtin, ji ber vê yekê, li şûna avakirina dewletekê, divê têkoşîn bê kirin ji bo ku pergaleke siyasî ku mafên çandî û siyasî yên hemû mirovan dihewîne, bê avakirin. Ji ber ev rêbaz metisiya li ser gelekî din ku ji aliyê pergala netew-dewletê bê kirin, dûr dixe. Nirx û prensîbên hevpar ên civakê ji etnîkeyên wê girîngtir têne meyzandin. Li şûna helandina nasname, çand û ziman, ev îdeolojî fikra “Neteweyeke Demokratîk” pêş dixe û pêşniyar dike ku cih ji hemû nasnameyan re were dayîn, da ku xwe rêxistin bikin û werin temsîlkirin. Di pratîkê de, ev tê vê wateyê ku di bin pergaleke komunal de, hebûna hemû mezheb û olan di saziyên biryardanê yên wekî meclisan de tê garantîkirin.

### Ji bo demokrasiyeke rastîn komun û meclis hatin avakirin

Sîstema komun û meclisan ji destpêka şoreşê ve hate avakirin, da ku modela netew-dewletê derbas bike û demokrasiyeke rastîn a li ser bingeha azadiya jinan, jîngeh û pirrengiyê pêk bîne. Sîstema komun û meclisan dihêle ku civak xwe di hemû qad û aliyan de birêve bibe û birêxistin bike. Herwiha ew têgehên kûr ên kokê ne jî. Ew wekî vejînek ji şêwaza jiyana bav û kalan di civakên berê de tê dîtin ku tê de peyva “civat” behsa komek mirovan dike ku li yek deverê dijîn, ji bo parastina xwe, birêvebirina jiyana xwe û çareserkirina pirsgirêk û zehmetiyên di nav civaka xwe de, têne cem hev.

Di têgeha Neteweya Demokratîk de, civak yek ji stûnên herî girîng e. Herwiha her ferdek wekî hebûnek komunal, beşdarek çalak di hemî aliyên jiyana komunal de tê dîtin. Ferdek wekî hebûnek civakî tê dîtin ku dixwaze bibe beşek ji civatek exlaqî û siyasî û di nav wê de rolek çalak bilîze. Her kes di nav civakê de şaneyek yekgirtî û tam pêk tîne. Bi vî awayî, komun û meclîs hatin avakirin, ji şaneya herî biçûk bigire heta şaneya herî bilind a komunan û di encamê de bi Meclisa Gel gihîştin lûtkeyê.



### Rêber Apo derbarê komunan çi dibêje?

Rêber Abdullah Ocalan girîngiyke mezin dide komunan û di paraznameya xwe ya pêncan de wiha dibêje: Ferd û welatiyê neteweya demokratîk bi qasî azad e, ewqasî jî divê kominal be. Ferdê neteweya demokratîk azadiya xwe di kominalîteya civakê de dibîne ango di civakên piçûk ên bêhtir kêrhatî de dibîne. Kom an komuna demokratîk û azad dibistana bingehîn e ku ferdê neteweya demokratîk lê çêdibe.”

Rêber Abdullah Ocalan tekez dike ku heta dawiyê komun xwedî li ferdên xwe derdikeve û wiha dibêje: Yê nebe komun, yê bi komunî nejî, ferdîtiya wî jî pêk nayê. Gelek cureyên komunan hene û di her qada jiyanê de dibin. Li gorî cudahiyan, ferd ji komunekê zêdetir dikare di nava koman de cih bigire. Ya girîng ew e, ferd li gorî ked û cudahiyên xwe zanibe di nava koman de cih bigire. Ferd berpirsiyariya xwe ya beramberî komun an jî koma girêdayî wê ye, weke pîvana sereke ya exlaqîbûnê dihesibîne.. Exlaq girêdan û hurmeta ji bo jiyana komun îfade dike. Komun yan kom jî heta dawiyê xwedî li ferdên xwe derdikeve, bi vê jî wan diparêze û jiyana wan misoger dike.”

Rêber Apo piştrast dike ku prensîba bingehîn a avabûna civak û komuna mirov prensîba berpirsiyariya exlaqî ye herwiha karektera demokratîk a kom û komunan azadiya kolektîf pêk tîne, bi gotineke din kom û kominên polîtîk pêk tînin û wiha diyar dike: “Kom û komunên ne demokratîk nikarin polîtîk bibin. Kom û komuna ne polîtîk jî nikare azad bibe. Di navbera demokratî, polîtîkî û azadiya komunê de wekheviyeke şidandî û hişk heye.”

Rêber Apo wiha diyar dike: “Welatî û ferdê azad bi tenê dikare di nava vê jiyana kominal a demokratîk de pêk bê. Bi giştî welatî û ferdê neteweya demokratîk, bi taybetî û bi şêweyê bêhtir berbiçav welatî hewcedariyeke jiyana bi berpirsiyarî, exlaqî û polîtîk e. Ev hewcedarî di heman demê de divê weke erk û mafekî bingehîn jî bê fêhmkirin. Kengî dewletên netewe van maf û erkên me yên bingehîn qebûl kirin, Kurd jî dikarin erk û mafên bingehîn ên welatîbûna van welatan qebûl bikin.”

### Pêwîst e komun û meclis hîn çalaktir bibin

Di dawiya rapora xwe de em ê hinekî behsa rewşa niha bikin, her kes niha dihzire di nava entegrasyona ku di 29’ê Çileyê de di navbera QSD’ê û hikumeta demkî ya Şamê de hatiye îmzekirin, wê sîstema komun an jî meclisan bê rakirin an jî bimînin? pirs jî di vê de rê de ye. Ger em nirxandinên li jor bînin bîra xwe ku çawa em dibêjin Komun û Meclis bingehên civakê ne, ji bo wê jî yên ku civak bi rêya wê tên birêvebirin ew in, lewra ne mumkine sîstema bingehîn a civakê were rakirin. Berovajî wê çalakirina wan bingeha avakirinê ye. Wê komun û meclis bimînin situnên civakê û bi rêya wan civak komî ser hev bibe.

FENER



Idrîs Henan

## Sûriyê di bin navê veberhênana aborî de tê firotin

Aloziya li Sûriyê ji destpêka 2011`an ve ne tenê leşkerî û siyasî bû, lê belê bi demê re diyar bû ku aliyekî meselê yê sereke; ji nû ve vesazkirina aboriya welat û desteserkirina navend û jêderên hêza darayî ye.

Di heman çarçoveyê de, taybetkirina malkaneyên giştî weke sernavekî serdema vê hikûmeta veguhzê û girîngtirîn refleksa qonaxa nû ne. Hikûmeta defakto ya HTŞ van kiryaran weke amûrên reforma aborî û baştirkirina karîgeriya xizmetguzarî nîşan dide. Yanê bi gotineke heq, dizî û firotina mal û milkên welêt rewa dike! Ev karekterê nû yê desthilatdariyê, çarenûsa siyasî û aborî ya Sûriyê ber bi jirêderketineke nû ve dibe. Nemaze dema em zanibin ku hemû kiryar di heyamekî nezelal, bê aramî, bê çavdêrî û bi guman de pêk tên. Mirov, di rewşeke wisa nehevseng de, nikare ji (dabeşkirina mal û milkên welat) bêtir ti wateyeke din bidê.

Tişta diyar û hatiye isbatkirin ku ev rewş û kiryar ne nû ye. Lê belê ji roja ku dewleta Tirk a dagirker destwerdana Sûriyê kiriye re dest pê kiriye. Ango; dema ku şert û mercên razber û şênber ên hundir û derve bi nav hev dikevin, mirov rola Tirkiyê ya berbiçav ferq dike. Taybet li bakurê Sûriyê ku qadeke gewre ya dagirkeriyê ye. Dema ku mirov çavekî li wê qadê dixe, rola beloq û bandora aboriya Tirkiyê dibîne. Ji Lîreya wê bigire heya birêvebirina sazûmaniyên jiyanî yên weke ceyran, av û tendirustiyê ve were. Hemû jî girêdayî bazar, kargêrî û çarşiya Tirkiyê ne. Ji lew re; em nikarin realîteya heyî ji stratejiyeke hê mezintir a serweriyê bibirin. Armanca wê ya bingehîn jî entegrekirina li ser bingeha daqurtandinê û Sûriyê bê aboriyeke navendî hiştin e.

Tevî ku Tirkiyê hewl dide niyetên xwe yên tekûzkirina dagirkeriyê veşêre û weke destekdan nîşan bide, lê tişta li ser erdê berovajî vê yekê ye ku ji Sûriyê pirtir, tenê xizmetî azwerî û çilekiyên Tirkiyê dike. Di armanca sereke ya van nêzîkatiyên Tirkiyê de, lawazkirina serweriya navendî ya Şamê heye ku li ser bingeha serweriyeke aborî, her tiştî li Sûriyê bi Enqerê ve girêde. Bê guman ev yek jî dê destê wê ya siyasî li Sûriyê bi awayekî domdar dirêj bihêle.

Hikûmeta demkî ya HTŞ li Sûriyê hinek biryarên balkêş di derbarê aboriya welat de derxistine. Di van biryaran de gelek beşên stratejîk ên karîgeriya enerjî, av, ceyran û tendirustiyê dane ber taybetkirin û veberhênana biyanî ku girêdayî şîrket û fîrmeyên Tirkiyê û welatê Kendavê ne. Çendîn HTŞ hewl dide weke ji nû ve birêxistinkirin nîşan bide, lê çavdêr û aborînas dibêjin ku; sazî û dezgehên bingehîn ên xizmetguzariyê li Sûriyê tûşî mentelîteya qezenc û zirarê dibin. Ji xwe divankên bilind ên elektirîkê li Sûriyê berbiçav in.

Vê yekê metirsî xistiye dilê Sûriyeyiyan ku li kêleka ceyranê, malkaneyên av, enerjî û tendirustiyê jî werin taybetkirin. Her wiha karmendên van saziyan jî di nav wê xofê de ne ku dibe ev guhertin tesîrek neyînî li li pozisyona wan a bike û bê kar bimînin.

Weke encam, taybetkirina malkaneyên giştî, ne birêvebirina dahatuyan e, lê belê çalekiyeke parvekirina desthilatdariya aborî û siyasî ye. Rola Tirkiyê weke rola hemû hêzên destwerdanê, sereke ye. Têgihaştina rast; di bin navê razemeniya aborî û veberhênanê de, firotina şiyana aborî ya Sûriyê û dabeşkirina çîneyatî ye.



# Koma Berxwedan ‘Li mîras û kelepora xwe xwedîderketin’ piştî 7 salan derket pêş

Hunermendê destpêkê yê Koma Berxwedan Cewad Merwanî anî ziman ku Koma Berxwedan a ku ji salên 1983'an ve ava bûbû û di 2019'an rawestiya bû, bi mijûlbûyîn û perspektîvên Rêber Apo dihate birêvebirin û got, “Aktîvkirina Koma Berxwedan xwedîderketina li mîras û nirxên wê ye, em ê mîrasa vê komê bidin jiyandin û ji bo xizmeta vî gelî me xwe amade kiriye.”

**Zana Roj**

Koma Berxwedan yek ji mîrasên huner û awaza gelê Kurd e ku bi salên xwe yên dirêj û girêdabûna xwe bi niştîmanperweriyê re, cihê xwe di dilê her maleke welatparêz de çêkir. Piştî rawestandina nêzî 8 salan di heyva Nîsana 2025’an de careke din derket pêşberî gel. Girêdayî vê kombûna nû yek ji endamên destpêkê yê vê komê Hunermed Cewad Merwanî bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeîvîn wiha bû:

**Koma Berxwedan Ji salên 1983’an ve hatiye avakirin, ev kom çawa û di derfetên çawa de hat avakirin, endamên destpêkê çiqas û kî bûn, her wiha stran û çalakiyên di wê demê de hatine amadekirin çiqas bûn. Em dixwazin hûn bi giştî ji me re behsa salên destpêkê yên avakirina vê komê bikin?**

Belê: di dema avakirina Koma Berxwedan di sala 1983’an de, ez bi xwe li Amedê bûm li wê derê agahiya me çêbû ku Komek bi vî awayî hatiye avakirin. Û ev kom ji aliyê Rêveberiya me ya Tevgera Azadiyê Serok Apo ku perspektîvên wê hemû Rêbertê dabûn, ve hatiye avakirin. Şehîd Sefqan û Şehîd Mizgîn van herduyan serkêşiya wê kirine, herwiha Xemgên Bîrhat, Seyîd Xan, Xelîl Xemgîn, Serdar, Emele, Şehîd Çiya û gelek hevalên din van kesan li Ewropayê ev kom avakirine.

Helbet dema ku şoreşek dest pê dike di aliyê siyasî, civakî, hunerî û hemû aliyan de gavên xwe yên destpêkê diavêje. Yek ji van qadan jî ku divê xwe birêxistin bike qada çand û hunerê ye. Di wê demê de ji bo em jî weke qada çand û hunerê ji gel û şoreşa xwe re bibin bersiv; bi riya huner û avakirina vê komê bû. Gelek hunermend û kesên navdar cihê xwe di nava vê komê de girtin, bi sedan koriya hebûn, demkî be jî lê gelek hunermendên Kurdistanêcihê xwe di nava vê komê de girtin. Helbet dema jinûve tê destpêkirin, wê zehmetiyên wê hebin. Di aliyê xwenaskirin û belavbûyînê de me zehmetî kişandin. Di sala 1992’an de ji Şemê Serokatê ez şandim Ewropayê û got here hunerê li wir bike, em hatin û me jî cihê xwe di nava komê de girt. Di salên 1993-94’an ji aliyê Ewropiyan ve di festîval û çalakiyên wan de ev kom balkêş bû û gazî beşdarbûna Koma Berxwdan dikirin.

Koma Berxwedan bi hemdemiya ku di Kurdistanê de şoreşek tê lidarxistin, di hundir wê şoreşê de berxwdanî, qehremanî, şehdet û bûyerên ku li giştî Kurdistanê dihatin rûdan di heman demê de qirkirinên ku li ser gelê Kurd dihatin kirin, her wiha ji bo hemû azadîxwazên li cîhanê ku dengê xwe derdixistin, vê komê bi her awayî ev yek anîne ziman û di çand û hunera xwe de her ev esas girtiye. Ş.Sefqan, Ş.Mizgîn, Ş.Çiya û gelek hevalên din debasî çiyê bûn, piştre Ş. Serhed ji Ewropayê derbasî çiyê bû û Şehîd ketin, hevala me Dilar (Turken Îpek) ku hîn jî di zîndanê de ye.



Weke ku ez di 1992’an de hatim Ewropayê û wê demê Ş.Sefqan nîn bû, Ş.Mizgîn me hev du li Bakurê Kurdistanê dî bû û me kar jî bi hev re kiribû. Ji ber wê dema Ş.Mizgîn li Tatwanê şehîd ket, hebûn û naskirina wê bandoreke mezin li min kiribû, û min stranek li ser wê çêkir. Dema em hatin qada Ewropayê me ne tenê karê hunerê dikir, hevalan çi erk di nava rêxistinbûna civakê de bida me, me dikir. Di sala 1994’an de ez û Ş.Serhed piştî me dewreya akademiyê xilas kir, em hatin bajarekî Ewropayê da ku em xebatê hunerî bimeşînin. Li wir me Koma Berxwedan ya ciwanan avakir. Piştî 1994’an ez hatim û gelek hevalên din cih tê de girtin. Koma Berxwedan ya ciwan gelekî bandora wê nebû, lê Koma Berxwedan piştî 1995’an de hemû heval li hev kom bûn weke careke din ev kom zindî kir, bi vê komê re me orkestra gelêrî dest pê kir.

Ev orkestra gelêrî di giştî de Serokatê mudexele dikir, û min jî bi rêve dibir bi qas, Rêbertî di her alî de mudexelke dikir, li ser cil û bergên me heta disekinî ku wihda dibe û wiha nabe..bi perspektîv, rê û rêbazan derdiket pêşberî me. Çawa ku di 1995’an de televezyona me jî derket, ev orkestra gelêrî 21 caran derket ser sehnê. Ev orkestra bi awayekî gelekî xurt çêbû û heyanî sala 2000’an wiha dewam kir. Gelek hunermendên ku niha cihekî girîng di hunerê de digrin û navdar in, ji nava wê orkesterê derketin.

**Hûn weke endamên destpêkê yên vê koma bi dîrok, stran û awazên vê komê, di aliyên yekîtiya neteweyî û rihê welatparîziyê de rolekî çawa lîst, di avakirina mîrasa hunera Kurdî de ev kom xwedî bingeheke netewî ye, hûn di vê derbarê de çi dibêjin?**

Helbet rola Koma Berxwedan di vir de çi bû? di nava welêt de gelek berxwedanî, qehremanî, şehadet tên çêkirin û gelê me bi hezaran koçber dibe. Koma berxwedan di îfadekirin û anîna ser ziman de roleke pir girîng dileyîst. Koma Berxwedan him îdeolojîk, çandî û hunerî bû û him jî di pratîka xwe ya wê demê de destkeftî, berhem û roleke girîng leyîst. Bi guhdarkirina stranên Koma Berxwedan bi sedan keç û xortên welat berê xwe didan qadên têkoşîn û berxwedanê. Mirov dikare gelek tiştan bibêje; ji destpêkê heyanî beriya girtinê, Rêbertî li ser vê komê disekinî. Bi giştî di nava Kurdistanê de avakirina vê komê pêwîstiyek bû. Çima? Ji ber hunereke resen, paqij, hunereke ku rastî û êşa gelê xwe radixist ber çavan û ji devê vê komê dihat hunandin.

Ji 2001’ê û pêve ev kom piştî girtina Serok li Ewropayê gelek konsert hatin çêkirin, me hewil da ku em dibistaneke taybet ji bo vê komê bidin avakirin, da ku em ciwanan perwerde bikin, lê belê bi mijûlbûna me bi karên bîrokratîk re me ev yek pêk neanî. Di 2018-19’an de me hewil da em careke din vê komê aktîv bikin, lê meseleyên weke koronayê, gelek hunermendên me bi serê xwe kar kirin herwiha ji ber hinek sedemên din, me navberek dayê.

**Piştî zîdetirî 8 salan ji rawestandina xebatê vê komê, we îsal avabûna xwe careke dinragihand, gelo armanc ji vê yekê çi ye û bi taybet di vê demê de hûn ê bi amadekariyeke çawa derkevin pêşberî gelê Kurd?**

Piştî 7-8 salan me hewil da ku em vê komê careke din zindî bikin û ji bo çi. Niha ev kom da ku ji nû ve zindî bibe, xebatê xwe yê hunerî, dîrokî, arşîfî û li mîrasa xwe xwedîderketin; pêwîst bû di vê demê bi tayebt de Koma Berxwedan careke din derkeve pêş. Ez bawerim li ser van mijaran nîqaşên me 5-6 heyavan hatin domandin. em çend hevalên ku ji her tiştî agahdarin di heman demê de dilşewatê vîî karî bûn, di destpêkê de me ev biryar girt, piştre me agahî da çend hevalên xwe yên din jî, yên ku dixwazin careke din xizmetekê bikin, bi vê awayî em hatin gel hev û me biryara avakirinê da.

Niha çima me careke din pêwîstî bi hatina gel hev ji bo vê komê me dît û hedefa me çiye? Niha muzîka Kurdî li Bakurê Kurdistanê bi taybet û li Başûr û Ewropayê jî, bi riyeke ne baş de diçe. xwebûna muzîka Kurdî nemaye, dixwazin muzîka xwe ya Kurdî ya resen , naveroka xwe vala bikin, û tiştên dîrokî tune û dejenere dikin û pê dileyîzin. Her wiha tişta herî bi êş ku huner û muzîka Kurdî kirine mijara tîcaretê. Me gelek ev mijar nîqaş kirin ku Koma Berxwedan careke din weke li mîrasa xwe derketin derkeve pêş. Mîrasa ji rojak u ev kom avabûye, tiştên kelepora Kurdî çi hene ku bi rêya resmiyetê lê xwedî derkeve. Me navê wê fermi jî wiha kiriye (Li mîras û kelepora xwe xwedî derketin).

Ji ber ku pêwîst e li mîrasa vê komê ya ku ewqas ked daye were derketin. Ew mîras çiye? Şehadetên ku di Kurdistanê û di nava komê de hatine kirin, qehremanî û têkoşîna ku her li ser zimanê vê komê hatiye bîranîn, koçberkirina gelê me û êşên ku dîtine, ev hemû divê xwedî lê were derketin. Em çend hevalên ku me ji nû ve ev biryar standiye, em xwe weke berpirsyarê vê yekê dibînin. Ji şaşiyan re bêjin, ev şaş e, di hema demê de piştgiriyê bidin hunera xwe ya resen û bibin alîkar bi her kesî re. Di aliyê manewî de wateyeke wî pir mezin heye, û di bingeh de bareke ku me daye ser pişta xwe, xizmeteke ji nû ve avakirine. Em di vê çarçoveyê de teng jî nafikirin, kom bikaribe li her derê, her kesî ku xwedî nirx, bîr û bawerî ne û xwedî emek in, em wan jî bînin gel xwe û car caran em bi hev re kar bikin. Ev yek ne tenê em di aliyê muzîkê û derketina li ser sehnê de difikriin, ji wê zêdetir xwedîderketina li nirxan, çand û hunera xwe ya dewlemend û em arşîfeke baş amade bikin ku em bidin ciwan, nifş, keş û xortên xwe. Armanc gelek berfireh e ku li gorî derfet û îmkanan, gav bi gav em ê bighêjin van armancên xwe, û mîrasa Koma Berxwedan bidin jiyandin û ji bo xizmeta vî gelî me xwe amade kiriye.

Bi cewherî ez dikarim van bêjim. Helbet di pêkanîn û pratîk de gelek girîng e. Em çi nêjin jî, pratîk wê îfadeya xebatê me bike.



Remezan Olçen

## Ji nû ve Koma Berxwedan

Beriya bi demekî koma muzîka Kurdî ya efsanewî; Koma Berxwedan ji nû ve xwe ava kir. Endamên komê bi bernameyekê hem dîrokê bi xwîn û goşt û ruh kirin hem jî ji bo paşerojê nîşan dan ku ji bo milletê Kurd serdema kom û komînan ji nû ve dest pê dike. Em jî endamên komê yek bi yek silav û pîroz dikin. Siheta wan xweş be.

Muzîk, ne tenê qadeke hilberîna estetîk e; di heman demê de hilgirê xurt ê nasname, bîr û berxwedanê ye. Bi taybetî di civakên ku rûbirûyê polîtîkayên zext, înkar û asîmîlasyonê mane, muzîk vediguhere qadeke hebûna kolektîf.

Ji bo gelê Kurd jî muzîk, ji şêweyeke îfadeya kesane wêdetir, yek ji amûrên bingehîn ên parastin û jinûve avakirina bîra kolektîf e.

Dema ku em ji perspektîfeke postkolonyal ango pêvajoya piştî mêtingeriyê lê dinêrin, hilberîna muzîkê ne tenê wekî çalakiyeke hunerî, lê di heman demê de wekî çalakiyeke polîtîk jî dikare were xwendin. Di muzîka Kurdî de xebata kolektîf, di vê çarçoveyê de, tê wateya komkirina nasnameyeke parçebûyî.

Di serdemên ku ziman lê qedexe bû û îfadeyên çandî lê dihatin tepisandin de, muzîk wekî “mekanê bîrê” fonksiyonê dibîne. Di vî warî de, kevneşopiya Dengbêjiyê yek ji mînakên herî xurt ên vegotina kolektîf e; vegotinên ku wekî yên kesane xuya dikin, di rastiyê de îfadeyeke hevpar a ezmûna civakî ne.

Di serdema modern de, komên muzîkê bûne amûrên girîng ên jinûve hilberandin û veguhertina vê bîra kolektîf. Bo mînak, komên mîna Koma Wetan, Koma Agirî , Koma Berxwedan, Koma Azad, Koma Çiya, Koma Gulên Mezrabotan, Koma Asmîn û hwd… ne tenê muzîk û stranê çêdikin; di heman demê de tevkariyê li îfadeya polîtîk û çandî ya nasnameya Kurdî dikirin. Hilberîna kolektîf li vir ne tenê tercîheke estetîk, lê wekî helwesteke îdeolojîk derdikeve pêş.

Hilberîna muzîka kolektîf, di pêşketina hişmendiya postkolonyal de jî roleke girîng dilîze. Lewra pergalên kolonyal û hegemonîk bi gelemperî bi derxistina pêş a ferdperestî û kesanetiyê girêdan p tûkiliyên civakî qels dikin. Li hemberî vê, hilberîna bi komî; piştgirî, bîra hevpar û hişmendiya kolektîf xurt dike. Ev rewş, domdariya berxwedana çandî misoger dike.

Her wiha, hilberîna muzîka kolektîf di parastina ziman û kodên çandî de jî xwedî fonksiyoneke krîtîk e. Stranên ku bi zaravayên cuda yên Kurdî têne hilberandin, ne tenê berhemên muzîkê ne; di heman demê de amûreke zindîhiştina ziman in. Bi vê aliyê xwe, muzîk vediguhere pratîkeke jinûve hebûnê ya postkolonyal.

Performansên ser dikê û hilberîna muzîkê ya komî, di heman demê de hestiyariyeke kolektîf diafirîne. Sînorên di navbera guhdar û muzîkjen de zirav dibin heta bi asta xweya serketfî ev sînor tine dibin; muzîk ji ezmûneke kesane derdikeve û vediguhere parvekirineke civakî. Ev jî rê dide kirdeya-civaka postkolonyal ku xwe jinûve pênase bike.

Ji bo gelekî mîna gelê Kurd ê qedîm xebata kolektîf a di muzîkê de, ne tenê modeleke hilberîna hunerî ye; di heman demê de pratîkeke berxwedanê ya dîrokî û hêmanekî bingehîn e di avakirina hişmendiya postkolonyal de. Hilberîna muzîka kolektîf, dema ku dihêle nasnameyên tepisandî bêtir xuya bibin, di heman demê de derfeta avakirina xeyaleke hevpar a der barê paşerojê de jî pêşkêş dike. Bi vê yekê, muzîk ne tenê tiştekî ku tê bihîstin e; di heman demê de şêweyeke hebûnê ye ku tê bibîranîn, tê parvekirin û jinûve tê avakirin.

# Tevî astengiyan Şaredariya Amûdê xebatên xwe berdewam dike

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihemed Omerî destnîşan kir ku rewşa avhewayê bandoreke mezin li ser temamkirina projeyên şaredariyê kir û got, "Armanca me başkirina rewşa xizmetguzariyê û hêsankirina jiyana gel e, lewma tevî astengî û zehmetiyan em ê projeyan temam bikin."

**Navenda Nûçeyan**

Di çarçoveya domadina kar û xebatên xizmetguzariyê ji bo başkirina rewşa jiyanî ya gelê herêmê, li hemû deverên Rojavayê Kurdistanê şaredariyên gel bi hemû hewildanên xwe, tevî astengî û zehmetiyên cuda ku li hember wan derdikeve, berpirsyartî û erkê ku dikeve ser milê wan ji hêla pêşkêşkirina xizmetên bingehîn bi cih tînin.

Ji ber guhertinên avhewayê û zehmetiyên ku li ser herêmê di dema dawî de derbas bû, Şaredariya Gel a bajarê Amûdê bi zext û astengiyên cuda rû bi rû mabû. Ev yek bi awayekî rastersat bandor li ser kar û xebatên şaredariyê kir û hişt ku proje û pilanên şaredariyê yên salane heta astekê bê rawestandin. Di vê çarçoveyê de jî Şaredariya bajarê Amûdê bi hemû hewilanên xwe karîbû ku hevsengiyê bixe di navbera dabînkirina pêwistiyên gel û şopandina pilanên xwe yên salane di nava îmkanên bedrest de.

Di vî derbarî de, ji bo bal kişandina



li ser kar û xebatên şaredariyê, proje û pilanên dawî yên Şaredariya Gel a Amûdê herwiha astengiyên ku li hember wan derdikeve, Hevserokê şaredariyê Mihemd Omerî ji rojnameya me re axivî.

**'Derengmayîna projeyan ji her rewşa avhewayê bû'**

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihemed Omerî diyar kir ku pilanên wan ên sala 2026'an berdewamiya proje û xebatên sala borî ne û wiha anî ziman: "Lê ji ber sedemên avhewayê di nav de barîna baranê û bi taybet beref hişt ku kar û xebatên şaredariyê heya demekê bêne rawestandin, lê hîn projeyên me di asta pêkanînê de ne."

Ji nav van projeyan ew bû ku sûkeke mezin ji bo firotina sebzeyan bê ava kirin, di gavekê de ber bi rêxistinkirina tevgera kirîn, firotin, bazirganiyê, peydakirina pêdiviyên şêniyan bi awayekî hêsanî. Di heman demê de çareserkirina pirsgirêk û astengiyên çûn û hatina di hundirê bajêr de, Şaredariya Gel ya bajarê Amûdê dest bi avakirina sûkeke nû ya sebzeyan ji bo kirîn û firotina sebze û fêkiyan li dervî bajar kiribû, lê ji ber sedemên avhewayê hat rawestanin.

Herwiha projeya Herêma Pîşesaziyê ku ji ber heman sedeman hat rawestandin, tevî giringiya wêyî mezin di piştgiriya çalakiyên pîşesaziyê û peydakirina derfetên kar ji bo şêniyan.

Mihemed Omerî wiha berdewam kir: "Ji projeyên xizmetguzariyê yên herî giring ji bo başkirina binesaziya rêyan, projeya (kevirên şikestî) bû ku divêyabû şaredariyê di dawiya sala 2025'an pêkanîba, lê ji ber barîna berfê, ev proje hat rawestandin. Em li bendê ne ku rewşa avhewayê baş bibe da ku



demildest dest bi xebatan bikin. Tevî zehmetî û astengiyan jî tîmên teknîkî yên şaredariyê, karîbûn beşeke ji projeyê pêk bînin û 10 kolanên di nava bajêr de hatin qeşirandin, di gavekê de ber bi başkirina rewşa rêyan û hêsankirina tevgera trafîkê. Wê kar û xebatên me berdewam bike, heya temamkirina xebatê mayî yên projeyê, di nav de danîna medayên mayî û kevirên şikestî."

**Di aliyê mirovahî de jî şaredariyê rola xwe list**

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê wiha gotina xwe qedand: "Dema ku bûyerên dawî li harêmê qewimîn û pêleka koçberiyê destpê kir, Şaredariya Amûdê wekî beşek di nav komîteya awarte de cih girt, lewma şaredariya roleke xweyî giring ji bo peydakirina pêdiviyên koçberan yên sereke li stargehên ku koçber tê de cih girtin, lîst. Ji wan re elktrîk peydakir di rêya pêxistina jernetoran wekî din xizmetên paqijî û kanalîzasyonê pêşkêş kir. Heya niha jî em van xizmetan ji bo koçberan re dabîn bikin. Ev sedem heya astekê wekî zexteke mezin li ser îmkan û kadroyên şaredariyê kir, ji ber vê yekê di nava bajêr de asta hin xizmetan vegeriya paş û ji pêşîneyên xwe hemû xist bin xizmeta bicihanîna pêdiviyên koçberan di nava şert û mercên awarte de."

# Daketina nirxê lîreya Sûrî kirîza jiyanî dixe qonaxek aloztir

**Navenda Nûçeyan**

**Ji ber daketina nirxê lîyreya Sûrî û bilindbûna zextên aborî, herwiha cudahiya mezin a di navbera dahat û lêçûnê de kirîza jiyanî ya gel li Sûriyê kurtir dibe.**

Li gorî raporekê ku ji aliyê Nivîsgeha Kordînasyona Karûbarên Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî ve hatiye weşandin, tê de hat eşkerekirin ku lêçûna navîn a selika madeyên sereke yên xwarinê gihaştiye 169 dolarê Amerîkî bi qasî milyone û 970 hezar lîreya Sûrî ye, ev yek nîşan dide ku bi rêjeya ji sedî 2 bi dolar û ji sedî 4 bi lîreya Sûrî li gorî mehên borî, bilind bûye.



Ev bilindbûn berdewamiya pêla enflansyonê nîşan dide, êdî tenê bi nirxê serfkirinê girêdayî nemaye, lê belê di encama çend faktorên avahîsaziyê yên kurtir de ye, di nav de qelsbûna hilberîna herêmî, lêçûna veguhestinê ya bilind û girêdayîbûna bazarê bi hawirdekirinê re, digel qelsiya rêzedabînkirinê.

**Cudahiya lêçûnan di navbera herêman de**

Li gorî daneyan cudahiya lêçûnan bi awayekî berbiçav di navbera herêman de tê nîşan dan, li deverên navîn û başûrê Sûriyê lêçûna selika xwarinê dighêje 175 dolarî, piştre herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê di heman demê de li bakur û rojava jî bi rêjeya 156 dolarî kêm bûye. Ev wekî nîşaneyeke li ser cudahiya di nava astên peydabûna kelûpelan û dabînkirinê de. Zext ne tenê li ser xwarinê sînordar meye, ji ber ku bihayê selikek biçûk ya xwarinê dighêje 123 dolarî. Di heman demê ji bilî xwarinê, bihayê madeyên din ên girêdayî pêdiviyên paqijiyê jî bilind bûye, ku çarçoveya berfirhebûna buhayan nîşan dide, da ku aliyên cuda yên lêçûnên rojane jî di nav xwe de bigre.

**Kêmbûna hêza kirînê**

Li hember vê yekê, cudahî di navbera dahat û lêçûnên jiyanî de berfireh dibe, mûçe di navbera 200 û 300 dolarî de ye herwiha kiryên malan li Şamê dighêje 1000 dolarî, ev yek dihêle ku dabînkirina pêwistiyên bingehîn ji bo piraniya malbatan pir zehmet û dijwar be. Tevî zêdebûna mûçeyan, lê hîna jî gel nikarin bighêjin wê astê ku bi bihabûnê re hevsengiyê çêbikin, di nava dewmakirina rewşa neewlehiyê li hin herêman, zehmetbûna gihaştina xizmetên herî sereke û bilindbûna rêjeya bêkariyê.

Li gorî texmînên fermî nêzî ji sedî 80 ji gelê Sûriyê di bin xeta xizaniyê de dijîn, di çarçoveya bêkariya berdewam û qelsbûna xizmetguzariyên bingehîn, ku kurahiya kirîza civakî û aborî a piştrast dike.

**Lawaziya bazaran û xizmetguzariyan**

Tevî peydabûna kelûpelan a berdewam di nava bazaran de, lê ew bi awayekî ne rêkûpêk û di bin zexteke zêde de dixebite, ji ber lawaziya daxwazê û lêçûnên xebitandinê yên bilind, nemaze li çend bajarên bingehîn.

Di sektora enerjiyê de, kêmbûneke rêjeyî di bihayên qenîneyên xazê de hatiye dîtin, lê ev başbûn di çarçoveya berdewama sînordarkirinên li ser dabînkirina li hin deveran, qels dimîne, ev yek bazaran li hemberî guherînên bi lez rûbirû dihêle. Hin herêm jî başbûneke qismî di peydakirina xizmetguzariyan dîtiye, li hemberî berdewamiya tengasiyan li hin herêmên din ku cudabûna şert û mercên ewlehî û lojîstîkî nîşan dide.

**Kirîza mirovahî berdewam e**

Li gorî Komîserê Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî, kirîza mirovahî li Sûriyê hîn jî berfireh e, tê texmînkirin ku 16 milyon û 500 hezar kes di sala 2025'an de hewcedarê alîkariya mirovî bûn, tevî pirsgirêkên heyî hejmareke zêde ya penaber û koçberan vedgerin malên xwe.

Di raporê de hat diyarkirin ku piştî veguherîna siyasî li Sûriyê di 8'ê kanûna sala 2024'an de, zêdetirî milyonek û 300 hezar penaber vegeriyan heriwha milyonek û 900 hezar koçberên navxweyî ji 27'ê Mijdara sala 2024'an û ve vegeriyan e herêmên xwe yên resen. Di encamê de, kirîza jiyanî li Sûriyê êdî ne tenê nîşana guherînên rêjeya serfkirinê ye, lê veguheriye kirîzek kûr a ji kokê, ku bi qelsiya aboriya herêmî û nehevsengiya bazarê ve girêdayî ye, ku her başbûnek qismî di bihayan de demkî û nedomdar dike, di çarçoveya nebûna çareseriyên aborî yên berfireh de. Ev nîşane piştrast dikin ku Sûriyê bi yek ji qonaxên aborî yên herî tevlihev re rûbirû ye, ku tê de enflasyon bi xizanî û xizmetguzariyên nebaş ve girêdayî ye.



# 'Yekîtiya gelê Kurd garantiya azadiya hemû gelên Îranê ye'

Endama Meclisa PJAK'ê Zeynep Xorasan destnîşan kir ku di Îrana nû de civakeke demokratîk û azadîxwaz dikare rola xwe baştir bileyîze ku gelê Îranê ji tarîtiya 47 salan derxîne ber bi ronahiyê ve û wiha got: "PJAK û KJAR xwedî proja Neteweya Demokratîk in, ji bo Îraneke nû dikarin pêşengiyê ji hemû gelên Îranê re bikin. Sîstemek demokratîk dikare hemû gelan hembêz bike, civaka Îranê ya rengîn biparêze û bîne gel hevdû."

**Tekoşîn Amara**

Di derbarê rewşa Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de endama Meclîsa PJAK'ê Zeynep Xoresan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**- Di şerê Rojhilata Navîn de armanca qirkirina Kurdan ji aliyê hêzên hegemon ve bûye mijara esasî; çi li Rojhilat, çi jî li herêmên din hûn van pilanên heyî çawa dinirxînin?**

Em wekî gelê Kurd ê kevnar, yên keviyên Zagrosan li ser van axan gelên herî qedîm in. Bi hezaran salan em têne înkar û qirkirin; bi taybet di 200 salên dawiyê de em bi qirkirinekî fîzîkî, çandî û fikirî re rû bi rû dimînin. Kurd hem ji aliyê hêzên Rojhilata Navîn mînak wekî dewletên Tirk, Ereb û Îran, hem jî ji aliyê hêzên hegemon ve rastî êrîşên tûj û tije tên. Lê heqîqetekî wisa li holê heye: Kurd ew gelê ku li Rojhilata Navîn hêza herî zêde ciwan e, xwedî ezmûneke jiyanê ye û hêza berxwedêr e. Gelek caran gelê Kurd rastî îxanet û bahozan hatiye, lê wekî dara mazî kokên xwe kûr berdaye axê, tu bahozan nikariye koka wan bihejîne. Dîsa mînak dewletên wekî Îran, Sûriye û Tirkiye heta roja me ya îro jî Kurdan înkar dikin. Lê hêza herî rêxistinkirî, xwedî bername û proje li Rojhilata Navîn Kurd in. Yanî di Rojhilata Navîn de, hêza ku ji vîna Kurdan re rêz raber neke û statuya gelê Kurd nas neke, wê şansê wan ê serkeftinê tune be. Dewletên Kurdan înkar bikin, wê nikaribin pirojên xwe pêk bînin. Me got Kurd xwedî stratejiyeke ronak in û xwedî xeta sêyemîn in; xeta me diyar e: civakekî azad, wekhev, di wê civakê de mafê hemû mirovan bê parastin.

Pîlanên hêzên heyî li ser Kurdan ew e ku Kurdan ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Lê ew Kurdên kevin ku xwe didan bi karanîn dema wan çûye. Kurdên ku niha heyî Kurdên ku Rêber APO ava kiriye; Kurd li dijî sêdarkirinê, li dijî girtin û sertewandinê radibe, serhildêr e. Kurdê ku ji bo mafê Kurdan biparêze ne carekê, bi dehan caran dikare xwe feda bike. Kurdê sedsala 21'ê bi cesaret e, Kurd ji bo parastin û azadiya xwe, xwe rêxistin dike, Kurd xwedî vîn e û Kurd ji bo parastina nirx û çanda xwe dikare xwe feda bike.

**-Ev zêdetirî mehekê ye şer li Îran û Rojhilat berdewam dike, xeta Kurdan li wan herêman ji bo xwe hilbijartine çi ne û çawa dikarin nasnameya Kurdan biparêzin?**

Ev bûye zêdetirî çil rojî şerekî giran di navbera DYA, Îsraîl û Îranê de berdewam dike. Li gel ku tu guhertinek di çarçoveya daxwezên civak û gelan de pêşneketiye, agirbestek demkî hatiye îlan kirin. Ev şer, şerê berjewendî û yê enerjiyê ye. Ev şerek e ku tê de mafê jinan, ciwanan û hemû mirovên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê nayê parastin. Şerek e ku tê de ji bermayiyên dîrokê bigire heta xweşikiya jîngehê her tiştî wêran dike. Sedema derketina vî şerî dewleta Îranê bixwe ye. Em dikarin mînakekê bidin: di aliyekî de şer giran bûye, mirov tî û birçî ne; ji aliyekî din de dewleta Îranê her roj ciwanên bêguneh û bê suç, bi tenê ji ber ku mafê azadiya xwe xwestin sêdar dike, her roj bi dehan bi navên cuda digire, îşkenceyên fîzîkî bigire heta yên ruhî re derbas dike.

Ji bo ku hebûna Kurdan em biparêzin, yek şertê vê heye. Ew jî ev e: bûna xwedî xeteke bawerî û bîrdoziyekî li ser esasê heqîqetê. Ji bo parastina mafê Kurdan em di wê baweriyê de ne, em wekî PJAK û KJAR xwedî piroja Neteweya Demokratîk in û em ji bo Îraneke nû dikarin pêşengiyê ji hemû gelên Îranê re bikin. Sîstemek demokratîk dikare, hemû gelan hemêz bike, civaka Îranê ya rengîn biparêze û bîne gel hevdu. PJAK jî xwedî rêxistinek demokratîke ku xwe li ser paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jine bi rêxistin dike. Di Îrana nû de civakekî demokratîk û azadîxwaz dikare rola esasî bilîze û dikare gelên Îranê ji tarîbûna 47 salan derxîne nava ronahiyekê. Ev ronahî roj bi roj nêz dibe, dewleta Îranê bi vî zihniyeta xwe ya desthiltdariyê we, demên xwe yê daviyê jiyan dike. Ji bo wî ye ku evqasî di demên xwe yê zehmet de êrîşê ser gel û civakê dike.



**-Li Rojhilat û Îran Partiyên Kurdan yektiya xwe avakirin; ev yektiya çiqasî bandor li Îran û parastina mafê Kurdan bike?**

Di Rojhilatê Kurdistanê de bi salan e ku gelê Kurd li bende ye bi yek dengî qîrîna êş û janên dilê xwe bigihîne hemû cîhanê. Bi salan hesreta yekbûna yektiya gelê Kurd jiyan dike. Gelê Rojhilatê Kurdistanê di wê zanistiyê de ye ku ancax bi ruhê yektiyê dikare bigihîje azadî û hemû mafên xwe. Ji bo pêşiya êrîşan bigirin, bi ruhê komîn û hevgirtinekî rast dikarin bibin hêza çareseriyê ji hemû pirsgirêkên gelê Kurd û Îranê re. Ji ber polîtîkaya Îranê ew e ku gelan dike dijminê hevdu û li ser vê temenê xwe dirêj dike. Siyaseta dewleta Îranê ya rojane ew e ku di her malbatekê de ji bo parçekirina civakê ji xwe re ajanek yan jî dibêjin besîçekî çêdike. Em di wê baweriyê de ne ew sekna partiyan a perçebûyî êşên gelê Kurd zêde dikirin, hezkirina ji nîştiman re kêm dikir û bêhêvîtî çê dikir. Ji ber wê ev yektiya gelê Kurd di aliyê ruhî û manevî de gelê Kurd bihêz kir û çavên wan ji bo azadiyê dan teyîsandin. Em çiqas bibin yek em ewqasî hebin, em ewqas bihêz bibin û hêzên desthilatdar û hegemon wê mecbûr bibin hesabê gelê kurd bikin. Em ji dîroka xwe dizanin sedema binketina gelê Kurd nebûna yektiyê û xwedî li hevdu derneketin e. Yê ku dê bihêle gelê kurd bi nasname, çand, zimanê xwe jiyan bike, ji hebûna me re rêz bê nîşandan û hesab bên kirin yektiya gelê Kurd e. Îro ji nan û avê zêdetir pêwîstiya me bi yektiyê heye. Dema ku me yektiya xwe çêkin em dikarin xwedî li nasname û dîroka xwe derkevin. Yektiya gelê Kurd garantiya azadiya hemû gelên li Îranê jiyan dikin e.

-Ji Raperina "Jin, Jiyan, Azadî" heta niha jin pêşengtî ji şoreşa **Rojhilat re dikin, heman demê** de, Îro em dibînin ku êrîşekî pir dijwar li ser jinan tê meşandin, hûn vê çawa dinirxînin?

Jinan di dîroka Îranê de her dem bi cesaret û fedakariyekî mezin rola pêşengiyê lîstine. Di sala 1979'an de ji bo hilweşandina pergala dagirker a Şah jinan bi cesaretekî mezin pêşengtî kirin. Îro jî ew roj careke din xwe nûjen dike; ji bo Îraneke demokratîk û azad, jin û ciwan hêza esasî ya pêşengiyê ne. Potansiyela şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" hîna wekî çemekî diherike û hîna jî di nava civakê de zindî ye. Ew şoreş ji bo jinan û ji bo civakeke azadîxwaz mîladeke ku jê venager e. Şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" hemû civaka li Îranê jiyan dike, ji jinan bigire ta ciwan û gelên Îranê anîn gel hevdu; di şeqaman de kirin yek deng, di jiyanê de kirin yek hest û di newroza biharê de kirin yek govend. Dewleta Îranê herî zêde ji jinên zana û rêxistinkirî ditirse. Bi vê şoreşê re jinan perda tarîbûna 47 salan qetand û berê xwe da zanista xwe bi rêvebirinê. Yanî li Rojhilatê Kurdistanê bigire heta Îranê mirov dikare bêje, berî şoreşê û piştî şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî". Model û Wêneyeke Îraneke nû "Jin, Jiyan, Azadî" ye. Xeta me azadiya gelê Kurd û gelên Îranê wê bi fikir û felsefeya şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" misoger bibe û wê bi serkeftinê tacîdar bibe.

**-Herê dawiyê banga we ji bo gelê Kurd çi ye?**

Em li ser vî bingehî berê xwe didin Îraneke rengîn a ku temsîla hemû civakan dike. Divê hemû gelê me bi ruhê seferberiyê xwe rêxistin bike û ji Îranê ku mafê jinan û gelan nas nake re bêje "na". Divê em bizanbin em tu mafên xwe û jiyana bi rûmet û azad teslîmî hêzên desthilatdar û dagirker nekin. Wekî Rêber APO jî dibêje: azadî bê bedel nabe. Sonda me ew e ji bo em azad jiyan bikin çi bê xwestin divê em bikin.

# ‘Berdewambûna şer li Rojhilata Navîn encamên erênî negirtin’

Siyasetmedar Fûad Umer da zanîn ku berdewamiya şer û pevçûnan li Rojhilata Navîn di sed salên borî de encamên erênî yên berbiçav dernexistin, li şûna vê, bûne sedema kûrbûna parçebûnan, belavbûna siyasî û got, “Îro projeya Kurdî, an jî çareseriya ku Rêber Apo daye pêş, yek ji modelên ku xwe dispêre aştî û avakirina civakê li ser bingehên demokrasiyê.”

**Hemza Sêvo**





Ji dirêjahiya dîrokê ve hêzên hegemon Rojhilata Navîn xistine nava jîngeheke tevlîhev ji şer û pevçûnan, di heman demê de van hêzên serdest konên reş li ser projeyên aştiyê de vegirtin. Derbarê heman mijarê berpirsê Ofîsa Têkliyên Dîplomatîk a PYD’ê li Ewropa Fûad Umer bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:

**-Hûn destwerdanen ku hêzên serdest di herêma Rojhilata Navîn de dikin çawa dinirxînin, ev planên ku îro tên meşandin çawa ne û ji kengî ve xebat li ser tê amadekirin?**

Rojhilata Navîn wekî herêmek jeopolîtîk tê pênasekirin û ew girîngiya xwe ji cihê xwe yê stratejîk ku sê parzemînan bi hev ve girêdide, ji bilî ku kenalên deryayî yên herî girîng ên cîhanê û dewlemendiyên mezin ên neft, gaz û madenan tê de hene. Van taybetmendiyan, herêm ji bo pevçûnên navneteweyî û pêşbaziya di navbera hêzên mezin de kiriye navendeke domdar. Wekî din, ew di derketina olên ezmanî de xwedî nirxên dîrokî ye û nirxên şaristaniyê yên ku bi hezaran salan dirêj dibin. Li Rojhilata Navîn em bi pirsgirêkên civakî yên herî kûr û berfireh re dijîn, di heman demê de welat û hikûmetên me yên herî paşketî ne û ji bo çareserkirina krîz û pirsgirêkên demdirêj ên sedsalan e, ji bo çaresrekirina van pirsgirêkan jî nêrîna bîrwerî û siyasî tuneye. Di vê çarçoveyê de, têgeha ‘Rojhilata Navîn a Nû’ piştî bûyerên 11’ê Îlonê bi awayekî pratîk û berbiçav derket holê, wekî projeyeke siyasî-stratejîk a ku armanca wê ew e ku herêmê ji hêla erdnîgarî ve ji nû ve biguherîne û ji hêla siyasî ve bi rengekî ku xizmeta berjewendiyên hêzên serdest dike, di serî de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Koka vê projeyê vedigere salên 1990’an, dema ku Dewletên Yekbûyî piştî bidawîbûna Şerê Sar bû hêza herî berbiçav a cîhanî û ji bo guhertina sîstema navnetewî, di nav de Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên wê yên istratejîk. Ev proje ne tenê bi guhertina rejîmê re sînordar e, lê jinûveavakirina avahiya dewlet û hevpeymanan e û afirandina kiyanên ku kontrolkirina wan hêsantir e. Qeyranên navxweyî û israra hêzên hegemon ku dev ji têgeha desthilatê bernade ku tenê temsîla komeke biçûk dike û ew jî dibe dewleteke serdest çavkaniyên gelê xwe kontrol dike, li welatên herêmê, bi taybetî welatên Ereb tên dîtin. Ev yek jî ligel têkçûna aborî û bilindbûna parçebûnên mezhebî, alîkarî da afirandina jîngeheke guncaw ku derfetê ji bo serkeftina projeya Rojhilata Navîn peyda kir. Ji destpêka xwepêşandanan di 2010’an de, qelsbûna netewdewletê li Rojhilat zelaltir bû û rê li ber destwerdanên derve vekir ku van krîzan ji nû ve armanc kirin da ku hevsengiya hêzê li herêmê ji nû ve xêz bikin. Dewletên Yekbûyî di vê çarçoveyê de hêza herî berbiçav tê hesibandin, xwe dispêre tevliheviya destwerdana leşkerî ya rasterast, nemaze li Îraqê û destwerdana neyekser bi rêya şerên wekîl, armanc dike ku çavkaniyên stratejîk, bi taybetî neft û gazê bike bin serweriya xwe. Washington xwest ku pergala herêmî bi rêya projeyên wekî ‘Rojhilata Navîn a Mezin’ ji nû ve teşe bide, rêyên aştiyê di navbera welatên herêmê û Îsraîlê de pêş bixe û rola hêzên hevrik ên mîna Îranê kêm bike. Berevajî vê yekê, hêzên din ên navdewletî yên wekî Çîn û Rûsya derketin holê, bi Çînê re balê dikişîne ser bandora aborî û ewlehiya çavkaniyênên enerjiyê. Lê Rûsya hebûna xwe ya leşkerî û siyasî xurt kir, bi taybetî li Sûriyê, di nav pêşbaziyeke navneteweyî de ku veguherînên ber bi sîstema pirralî ve nîşan da. Di encamê de, mirov dikare bibêje ku projeya ji nûveavakirina hevsengiya hêzan, encama hevbandoriya tevlihev a di navbera xwestekên Amerîkayê yên ji bo hegemonya gerdûnî ji salên 1990’an ve, krîzên navxweyî yên li welatên herêmê û pêşbaziya navneteweyî ya li ser çavkaniyên jiyanî ye. Serdestiya li ser enerjî û madenên stratejîk rêbaza herî girîng e ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi rêya wê Rojhilata Navîn dîzayîn bike, ew jî bi rengekî ku berdewamiya bandor û berjewendiyên xwe di sîstema navneteweyî de misoger bike.

**-Her tim ev hêzên serdest di rêveçûna vî şerî de ji bo pêkananîna berjewendiyên xwe, dixwazin hêz an jî dewletên herêmê bikişînin şer û tevlîheviyê, gelo hûn vê yekê çawa digirin dest?**

Rojhilata Navîn îro li gelek welatên wekî Iraq, Sûriye, Tunis, Lîbya û Sûdanê, xwedî hikûmetên lawaz û belavbûyî ne, nikarin serwer bin li ser xaka xwe an saziyên siyasî, civakî û aborî. Ev hilweşîna navxweyî ne tenê bi lazbûna siyasî re sînordar e, lê belê bi belavbûna dezgehên ewlekariyê, belavbûna hêzên çekdar ên derveyî dewletê. Ev yek lawaziya van welatan zêde dike û wan dihêle ku bi awayekî bi lez bikevin bin bandora destwerdanên derveyîn. Ev hemû şert û merc ji bo hêzên mezin, bi taybetî jî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, derfeteke berfireh didin ku sîstema herêmî li gorî berjewendiyên xwe yên stratejîk ji nû ve saz bikin û krîzên dewletê yên navxweyî veguherînin amûrên ji bo jinûvexêzkirina nexşeyên siyasî yên serwer.

Di nêrîn û analîzeke kû de dema ku hêzeke mezin dixwaze pergaleke siyasî, civakî û aborî ya nû ku li gorî berjewendiyên xwe li hev dike ji nû ve teşe bide an jî biafirîne, ew bi gelemperî neçar e ku vê yekê bi zorê ferz bike, nemaze eger avaniya navxweyî ya dewletê bi nakok be an jî nikare xwe bi rêxistin bike. Tiştê ku Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê di gelek daxuyaniyên xwe de bi eşkereyî tekez kirin ev e, li ber çavan e ku bidestxistina ‘aştî û aramî’ li hermeke ku bi parçebûnên kûr û lawazbûna navxweyî tê karakterîzekirin, pêdivî bi bikaranîna amûrên hêzdariyê û kontrola stratejîk heye, çi ji hêla leşkerî, aborî an jî dîplomatîk ve ev yek pêwîst dike da ku pêkanîna sîstema nû li gorî erjewendiyên wan bin. Di vê çarçoveyê de, rola Îsraîlê wekî aliyekî çalak a herêmî ya sereke xuya dike, ew li gorî armancên Amerîkayê tevdigere, çi bi rêya piştgirîkirina hegemoniya leşkerî û ewlehiyê, an bi rêya beşdarbûna di avakirina hevpeymanên herêmî de, an jî xurtkirina xwe di nav pergala herêmî ya nû de .

**-Eger rewş wiha bi şer û tevlîheviyê bidome ew ê çi bibe, wê pêşeroja herêm û gelan ber bi rewşeke çawa ve biçe? Herwiha rêyên çareseriyê çi ne?**

Berdewamiya şer û pevçûnan li Rojhilata Navîn di sed salên borî de encamên erênî yên berbiçav dernexistin, li şûna vê, bûne sedema kûrbûna parçebûnan, belavbûna siyasî û civakî, hem jî têkilî di navbera dewlet û civakê pir qels bû. Ev pevçûnên ku dubare dibin sedema windabûna baweriya di navbera gel û hikûmetan de. Cûdabûna mezhebî, etnîkî û herêmî, û tevliheviyên birêvebirina çavkaniyên aborî û aramiya siyasî derketin holê. Ji aliyê din ve, vekirina derî ji bo çareseriyên li ser bingeha aştîyane, jiyana bi hev re û qebûlkirina yên din derfetê dide ji bo jinûveavakirina civakeke aram û ewletir. Projeyên aştîyê, diyalog û însiyatîfên aborî yên beşdar dikarin çavkaniyên pevçûnê û şeran veguherînin jiyaneke hevbeş, di heman demê de rê li ber qeyranên civakî û siyasî bigire da ku hevkarî di navbera civak û welatan de were avakirin. Herwiha rikberiya bîrdozî û aborî li şûna ku serwerî li pêş bikeve dihêle civak sûdeke demdirêj werbigire, hem jî rê li pêşiya destwerdanên derve digire yên ku dixwazin bi sedema şeran destwerdanê bikin û ji şer sûd werbigirin. Ji ber vê yekê bijaka aştiyê û rêbazên wê li ser bingehê jiyaneke hevbeş û siyaseteke pêşketî ji şerên mayînde û bêserûber çêtir e, ev yek jî gelek caran hatiye tekezkirin. Di çarçoveya lêgerîna çareseriyên aştiyane û domdar ên krîzên Rojhilata Navîn de, îro projeya Kurdî, an jî çareseriya ku Rêber Ocalan daye pêş, yek ji modelên ku xwe dispêre aştî û avakirina civakê li ser bingehên demokrasiyê. Hêzên Kurd, çi li Îraq, Sûriye, Tirkiye an jî Îranê, êdî tenê li ser daxwazên neteweyî yên kevneşopî hûr nabin; Li şûna vê, nerînawan berfireh bû, avakirina civakekê ku tê de kes û komên xwedî îdeolojiyên cuda, ol mezhebên pirreng bi hev re bijîn, di heman demê de balê dikişînin ser mafên siyasî, aborî û çandî yên hemû pêkhateyên civakê. Ev proje di warê pirsgirêkên herêmî de guhertineke mezin temsîl dike, ji ber ku ew dixwaze ji terzê pevçûn û şerê domdar dûr bikeve, li şûna wê xwe dispêre diyalog, têgihiştin û hevkariyê, bi vî awayî derfetên rastîn ji bo avakirina pergaleke civakî ya aram û ewle diafirîne.



# Nexweşxaneya Telasîmyayê bi kêmbûna xwîn û dermanan re rûbirû dimîne

Rêveberê Nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd a Telasîmyayê Ehmed Hacî diyar kir zêdetirî 450 nexweşên Telasîmyayê li nexweşxaneyê tên tedawîkirin, ji ber hejmara wan ya zêde nexweşxane zehmetiyan di peydakirina xwîn û dermanên pêwîst de dikşîne.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**



Talasemiya komek nexweşiyên xwînê yên mîrasî ye ku bandorê li şiyana laş dike ji bo hilberandina hîmoglobînê, protîna di xirokên sor ên xwînê de ku berpirsiyarê veguhestina oksîjenê li seranserê laş e. Di vê rewşê de, laş kêmtir an jî cureyek neasayî ya hemoglobînê hildiberîne, ku dibe sedema hilweşîna bilez a xirokên sor ên xwînê û kêmbûna xwînê. Giraniya talasemiyê ji sivik heta giran diguhere, talasemiya biçûk heye, ku pir caran nîşanên zelal nîşan nade, telasemiya navîn heye, ku hewceyê çavdêriya bijîşkî ye û talasemiya giran heye, ku rewşek cidî ye û hewceyê dermankirina domdar e. Kesên bi telasemiyê nîşaneyên wekî zerbûn, westandina zêde û qelsiya giştî nîşan didin. Zarok dikarin ji mezinbûna derengmayî, ji bilî îhtîmala sekinandina mezinbûnê cefayê bikişînin.

Ji bo sivikirina barên nexweşan, di dawiya sala 2023’an de nexweşxaneya Telsaîmyayê hate vekirin, ev nexweşxaneya ku li taxa Enteriyê ya bajarê Qamişlo ye, 450 nexweşên ji herêmên Reqa, Şedadê, Dêra Zor û Cezîrê derman dikir.

Di navbera 6 û 29’ê Çileya 2026’an de yek ji wan serdeman bû ku rewşa tenduristiyê herî zêde ji êrîşan bandor bû, Nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd a ji bo Telasemiyê û Şewatê jî herî zêde bandor bû, ji ber ku gelek nexweş ji ber rewşa ewlehiyê nekarîn dermankirinê bistînin. Di nav krîzên ewlehî û aborî yên berdewam de, Nexweşxaneya Telasemiyê li Qamişlo ji bo jiyana bi sedan nexweşan xeta yekem a parastinê dimîne, lê îro ew bi pirsgirêkên cidî re rû bi rû ye ku ji bo misogerkirina berdewamiya dermankirinê û dabînkirina asta herî kêm a lênihêrîna tenduristiyê mudaxeleya lezgîn hewce dike.

Girêdayî vê mijarê Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd a Telasîmyayê Ehmed Hacî ji Rojnameya me re axivî.

**‘Rewşa tenduristiyê di bin bandora şert û mercên ewlehiyê de xirabtir dibe’**

Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd a Telasîmyayê Ehmed Hacî anî ziman ku Nexweşên Telasîmyayê ji 10 roj heta 15 rojan pêdiviya wan bi xwînê heye û wiha got: “Hejmara nexweşan bilind de û bexşîner kêm in, ev jî astengiyan li ber karê me derdixîne û gelek kes bê tedawî dimînin û carinan dighêja asta ku jiyana xwe ji dest bidin. Xwîna em bi dest dixin pirî caran bi riya bangewaziyê li ser mîdya Dijîtal e, herwiha bi riya ragihandinê ye, bi vî awayî mirov tên xwînê bexş dikin. Li herêmê bankek xwînê tune ji ber wê jî pir caran nexweş kêmasiya xwînê dibînin û malbat li bexşîneran digerin, lê carinan ew nikarin kesekî bibînin. Pêwst dike ku bankeke xwînê li Qamişlo were vekirin da ku ev pirsgirêk li herêmê çareser bibe. Ji bilî wê dabînkirina dermanan jî sînordar e û ti rêxistineke fermî di vî warî de alîkariyê nade me. Em di peydakirina dermanên biha de rastî zehmetiyên mezin tên, ji ber dermanên ku ji bo vê nexweşiyê re pêwîst dikin biha ne û hin ji wan heqê wan dighêje zêdetirî 400 dolarî, em dikarin van dermanan peyda bikin lê bi hejmarên kêm, ji ber ku hejmarên nexweşan geleke. Nebûna van dermanan, digel kêmbûna xwînê, rewşa tenduristiya nexweşan xirabtir dike û wan ji bo tevliheviyên giran ên ku carinan dikarin bibin sedema mirinê. Lê belê Heyva Sor hemû hewlên xwe dide ku wan peyda bike û heta ji me tê em alîkariya malbatan dikin.”

**Bi sedan nexweş jiyana wan di bin xeteriyê de ye**

Ehmed Hacî eşkere kir ku rewşa tenduristiyê li Herêma Cizîrê ji ber pêşketinên ewlehiyê yên dawî gelek bandor bûye û wiha pê de çû: “Nexweşxaneya Talasemiyê yek ji wan saziyên herî zêde zirar dîtiye di pêşketinên ewlehiyê yên dawî. Nexweşxane di dema êrîşên Hikûmeta Şamê de deh rojan girtî ma, ev yek jî dermankirina bi sedan nexweşên ku hewceyê veguhestina xwînê ya birêkûpêk in asteng kir. Niha nexweşên ji Reqa, Şedadê û Dêra Zorê ji bo dermankirinê nayên nexweşxaneyê. Pêdivîya wan bi veguhestina xwînê heftê carekê heye û ti agahî li ser awayê wergirtina dermankirina wan li cem rêveberiya nexweşxaneyê tune ye. Ev nexweş sê meh in ji bo dermankirinê nehatine û li wan deveran nexweşxaneyên taybetî yên telasemiyayê tune ne, ev jî xeteriya li ser jiyana wan zêde dike û ji bo vê çareseriyek lezgîn hecwe dike ji ber ku her diçe xeteriya li ser jiyana wan zêde dibe.”

**‘Her yekîneyeke xwînê dikare jiyana zarokekî rizgar bike’**

Rêveberiya Nexweşxaneya Heyva Sor A kurd ya Telasimyayê Ehmed Hacî axaftina xwe wiha qedand: “Ev nexweşxane, ku di dawiya sala 2023”an de vebû, yekane navenda dermankirina talasemiyê ya pispor li herêmê ye, ku rojane xizmetên belaş pêşkêşî bi sedan nexweşan dike, ev yek ji ber çavkanî û şiyanên sînorkirî, wê dixe bin zextek mezin. Vekirina beşek taybetî ya talasemiyê di sala 2025”an de gavek girîng bû ber bi sivikkirina êşa nexweşan ve. Lêbelê, pirsgirêkên berdewam, di serî de nebûna piştgiriya bijîşkî û lojîstîkî, hîn jî astengî li pêşiya pêşkêşkirina xizmetan di asta pêwîst de digirin. Em weke Rêveberiya nexweşxaneyê ji bo malbat û rêxistinên mirovî bangên lezgîn ji bo bexşandina xwînê û piştgiriya rewşa tenduristiyê didomîne û tekez dike ku jiyana bi dehan nexweşan bi hebûna van çavkaniyên girîng ve girêdayî ye. Her yekîneyeke xwînê dikare jiyana zarokekî rizgar bike, di rewşeke tenduristiyê ya hesas de ku pêdivî bi bersiveke lezgîn ji rayedarên peywendîdar û rêxistinên mirovî heye.”

# ‘Parastina paqijiya bajêr erka welatî û şaredariyê ye’

**Esmehan Gedro/ Qamişlo**

**Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku parastina paqijiya bajêr rê li ber belavbûna nexweşiyan digre û gotin, “Parastina paqijiya bajarê me erka welatiyan û şaredariyê ye. Pêwîst e şaredarî û welatiyên bajêr bi hev re bajarê xwe baqij û bedew bihêlin.”**

Li hin taxên bajarê Qamişlo bi awayekî berbiçav gemar û çop zêde bûye, ev yek jî dibe sedema belavbûna nexweşiyan û têkçûna bedewiya bajêr. Ev dîmen herî zêde li bazarên gerok yên mîna bazara yekşemê û bazara sêşemê tê dîtin. Sedema wê jî ew e ku firoşkarên van bazarên gerok bermahiyên sebzeyan li şûna xwe li erdê dihêlin û sebze xerab dibin û bêhneke pir nexweş derdikeve. Herwiha li hin kolanan jî ji ber ku hin welatî çopê diavêjin erdê ev rewş derdikeve.



Ezedîn



Silêman Yûsif

Li aliyekî din jî, piştî hatina werzê biharê êdî gel derdikeve nava xwezayê û hinekî bêhinvedanê dike, lê bermahiyê çopê li şûna xwe li nava daristanan û çolan dihêle û ev yek zerarê dighîne xwezayê. Herwiha zerarê dighîne avhewa jîngehê bi giştî. Dema em behsa paqijiyê bikin, helbet ne tenê şaredarî û karkerên paqijiyê berpirsyarê vê yekê ne, lê berpirsyartiya sereke dikeve ser milê welatiyan. Di serî de pêwîst e çanda paqijiyê di nava welatiyan de bê belavkirin û girîngiya wê bê fêmkirin.

Di derbarê vê mijarê de hin welatiyên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn û nêrînên xwe anîn ziman.

**‘Em bi hêvî ne ku şaredarî bêhtir girîngiyê bide paqijiyê’**

Welatiyê bi navê Ezedîn axivî û wiha got: “Em bi hêvî ne ku şaredariya bajêr bêhtir girîngiyê bide paqijyê û baştir bi karê xwe rabe, herwiha welatî jî kolanan qirêj nekin. Dema ku herêm ne paqij be wê gelek nexweşî derbikevin û bi taybet li cem zarokan. Çiqasî herêm û welatê me paqij be ewqasî jî nexwaşî dernakevin. Em bang li şaredariyê dikin ku li ser vê qirêjiyê bisekine û kolanên herêmê ji qirêjiyê paqij bikin. Helbet divî welatî jî kolanan qirêj nekin û alîkariya şaredariyê bikin.”

**‘Paqijî erka welatiyan û şaredariyê ye’**

Welatiyê bi nave Silêman Yûsif anî ziman ku paqijiya herêmê di destê şaredariyê û welatiyên bajêr de ye û wiha got: “Pir caran ez li kolanên derdora xwe dinêrim pir qirêje û carinan jî paqije. Daxwaza min ji bo şaredariyê ew e ku paqijiya herêmê bike û kesên ku li kolanan, gemarê davêjin erdê wan agahdar bikin û hişyariyê bidin wan ku gemara xwe nevêjin û bajarê xwe paqij bikin. Dema ku derdora mirov qirêj be xweza jî qirêj dibe, xemla bajaran û herêman bi paqijî û xwezayê xweş e. Ji ber ku bajar û herêm bi paqjiyê geş dibe.”

## Islam û mafê karkeran



Hafiz Ahmet Turhalli

1’ê Gulanê Roja Karkerên Cîhanê ye. Di sala 1886’an de li welatê Emerîka li herêma Şîkagoyê bi komekî Karkerên ku doza mafê karkeran kirine û dest bi tekoşînê kirine, ew roj e. Li Şîkagoyê li gor zanyariyan karkerên zêdetirî pênc hezar kargehan tevlî vê tekoşînê bûne. Bi hezaran karker hatine sêdarekirin û kuştin, ji ber van kuştinan roja yekê Gulanê weke Roja Karkerên Cîhanê hatiye pejirandin.

Navnetewîbûna vê rojê jî, 1889 li bajarê Parîsê di Enternasyonala duyem de hatiye pejirandin. Ew roj ev roj e, karker ji bo mafên xwe di 1’ê Gulanê de derdikevin kolanan û vê rojê pîroz dikin.

Di rastiyê de ev cîhana ku hatiye avakirin û berdewam tê avakirin bi ked û xweydana karkeran hatiye avakirin. Roja yekê Gulanê jî di cîhana Mirovan de divê weke grîngtirîn roj were destgirtin.

Cîhana ku me tê de çavên xwe vekir, weke cîhana Îslamî tê binavkirin. Çanda ku em tê de mezin bûn bandora Ola Îslamê li ser heye. Ol û bîrdozî formekî sereke daye miletên Rojhelata Navîn. Rojhelata Navîn jî zêdetirî wê karkerin. Rojava û Emerîkayê endusturî û kargehên wê mezin û zêde bin jî, erdnîgariya me jî rençberî û karêkeriyên demsalî zêde ne.

Ji ber rastiya jiyanê divê em pirsgirêka karkeran binasin û bişopînin.

Divê em lêbikolin ka ew ola ku formê dide civaka me, ji bo mafên bingehîn weke mafê karkeran çi gotiye û kesên bawermendên vê olê divê sergotarê de çawa tevdigerin?

“Ucreta xebatkaran çiqas xweşike.” (Zumer 74)

Pêxember SXL wiha gotiye: Sê kes hene ku ez roja Mehşerê dujminê wana me. Kesê tiştekî dide û hîleyê sextekariyê dike, kesê mirovekî dike kole difroşe û wê perê dixwe û karkerekî digre û heqê wî nade.” (Îbnî Mace 11,II, 814)

“Beriya xweydana eniya karkerî zuha bibe, heqê wî bidin.” (Ibnî Mace II, 817)

Hz Mihemed sXl ser be, sehabiyê xwe bi navê Muazê kurê Cebel destê wî maçî dike. Dibêje “Muaz destê te çima weha qelişîne; ew jî dibêje ya Resulê Xwedê ez ji bo îdara malbata xwe kar dikim ji ber wê destên min qelişîne.” Pêxember destên wî maçî dike û weha dibêje, “Ya Muaz ez sûnd dixum ku dê agirê Cehennemê nikaribe van destên te yên kedkar bişewitîne.”

Belê dema mafê karkeran were vegotin, weke civakekî misilman divê ev tevgera Pêxember û gotinên wî ji me re bibin pîvan. Pêxember destê yekê xwedan pere û xwedan desthelat maçî nekiriye, lê destê karkerekî maçî kiriye. Divê civaka misilmanan jî qîmetê bide karkeran û rençberan, ne ku qîmetê bide kesên kedxwar û desthelatdar.

Em îro bi eşkere temaşe dikin, li cem civakên misilman tu qedr û qîmet ji bo karkeran nîne, berovajî tepaserkirin û bê qîmetkirina karkeran heye.

Divê em vê rastiyê bibînin û vê rewşê biguherînin. Di cîhana Îslamî û kesên ji xwe re dibêjin em misilmanin, karkeran biçûk dibînin, mafên wan nadin û ji bo mafên wan tekoşînê piştguh dikin. Herî zêde kesên mafên wan tên xwarin û tu garantiyekî wan yên jiyanê nayin dabînkirin di cîhana Îslamîde, kesên karker û rençberin. Bê guman dema alîgirên olekî bûn alîgirên desthelatê ev rewş di her berdewam be. Mafê karkeran li gor Qur’an û jiyana Pêxember, mafekî pîroze û divê Misilman xwe ji kedxwariya karkeran biparêzin. An na; dê Pêxember di mehşerê de bibe neyarê kedxwaran.

Roja Karkerên Cîhanê pîroz be.